




Danerê Rojnameya pêşî a Kurdi  
Miqdad Mithed Bedirxan

# Armanc

Rojnameya Mehane

Hejmar, No: 134  
Çileya Pêşin  
December 1992  
Buha - Price  
15 SKR, 3DM

## "Hêza Çakûç" û Kurd



Di 24'ê Çileya Pêşin de Meclîsa Tirkîyê bi 234 dengen mudeta "Hêza Çakûç" 6 mehîn din dirêj kir. Partiyên hukûmetê; DYP û SHP'ê, parlamenterên ku çendakî berî ji ANAP'ê vejetiyabûn û ji HEP'ê 7 mebûsan ji bo dirêjkirina mudeta "Hêza Çakûç" de raya "erê" dan. Partiyên din yên muxalefetê; ANAP, RP, CHP, DSP, MÇP jî raya "na" dan. HEP jî wek partî neçû meclisê.

Berî dirêjkirina mudeta "Hêza Çakûç", di 11'ê Çileya Pêşin de pîsporê Wezîrîn Derve yên hukûmetên DYB, Îngilîstan, Franse û Tirkîyê li Enquerê ciyiyabûn û dirêjkirina mudeta Hêza Çakûç ca-rek din bi Tirkîyê dabûn qebûlki-rin.

Di eslê xwe de hemû Partiyên ku di Meclîsa Tirkîyê de temsîl dibin û partiyên derveyî Meclisê li diji "Hêza Çakûç" in. Lî ji ber ku Tirkîye li ser dixwaze bibe endama Civata Ewrûpayê, loma jî partiyên ku hukûmeta tînin meydanê, mecbûr dimînin ku daxwaza Xerbê û DYB bi cî bîne. Doh, wexta ANAP li ser hukum bû li hember vê hêzê dersnediket, lê iro ew li muxalefetê ye li hember derdikeve. Iro DYP-SHP li ser hukum in mecbûr in vê hêzê biparêzin, lê ew di muxalefetê de bûn ew li diji vê hêzê bûn.

Meriv şovenî û nasionalistiya partiyên "rast", "dîncî", "sosyaldemokrat" di warê pirsa Kurdi de dizane, ew li hember "Hêza Çakûç" in. Lî meriv di fahmkirin şela van partiyên ku kirasê "karkir", "sosyalist" û "gel" li xwe kirine û li hember berjewendiyên Kurdîn başûr dis-ekinin zahmetiyê dikşîne. Ji van partiyâ "Partiya Kar-

kir" ku serokê wê Dogu Perinçek e, berî ku Meclîsa Tirkîyê qerar bistîne ku wê mudeta "Hêza Çakûç" dirêj ke ya na, wî dest bi kampanyake li diji "Hêza Çakûç" kir. Û di vê qampanyê de gelek pere xerc rijand. Ew bi Partiya Sosyalist ya Yekbûyi û bi HEP'ê re li hember "Hêza Çakûç" panel û civîna organîze kirin.

Di eslê xwe de şela partiyên Tirkîyê yên "rast", "dîndar", "nas-yonalist", "sosyaldemokrat" û çep, wek Partiya Karkir (IP), SBP û HEP'ê di warê "Hêza Çakûç" de wekhev in. Partiyên "rast" çima ku "Hêza Çakûç" alîkariya Kurdîn Başûr dike û ew jî dewletê dewlet ava dikin, loma li dijin. İcar, partiyên "çep" jî wek IP, SBP û HEP'ê bi navê "anti-imperializm" li diji "Hêza Çakûç" derdi-kevin. Yanî ferqa partiyên "rast" û "çep" di warê "Hêza Çakûç" de wek ferqa di navbera "Coca Cola" û "Pepsi Cola" de ye.

Şela HEP'ê icoar ne wek ya berê bû, (HEP'ê derveyî 3 kesan cara berê li diji Hêza Çakûç raya dabû), lê dîsa jî negatîf bû. HEP'ê wek partî, grûba xwe ya Meclisê

di dema dengdanê de serbest hişt. Bi vî hawî bi Ahmet Tirk re 6 mebûsên din raya "erê" dan ji bo dirêjkirina vê hêzê. Pişti dengdanê Ahmet Tirk got ku; "ji bo ku ez bi şovenê Tirk re nekevîm eynî terefê min raya "erê" da." Lî ew mebûsên HEP'ê yên din ku neçûn Meclisê û bi vê helwesta xwe li diji "Hêza Çakûç" derketin, gelo tarîx wê wan efû bike? Ji ber ku ev parlamenter bi mîjîyê xwe na-fikirin û guhê xwe jî ji xelkê Kurd re girtine û nizanîn ew bi xwe jî ci dikin. Wan tenê ne guhê xwe ji gelê xwe yê Başûr re, her-wisa ji gelê xwe yê bakûr re jî girtine. Ger wisa nebûya wê guhê xwe bidana Diyarbekirîyan. Ji ber ku li gor lêkolina rojnama "Turkish Daily News" ji % 64,3'ê Diyarbekirîyan hebûna "Hêza Çakûç" û ji % 74,7 jî piştgiriya avakirina Dewleta Federa a Kurdistânî dikin.

Îro divê her Kurdekkî welatper-wer -ew li ci mewqiyê dibe bila bibe-guh bide dengê Kurdîn Başûr. Dibe ku partiyên başûr "feodal" bin û hin kîrinê wan ne bi dilê me bin, lê ev partî bi rayêن gelê xwe hatine hilbijartîn, meclîsa xwe ava kîrine, hukûmeta xwe dameziran-dine. Hurmeta gel girtin piva-na demokratbûniyê ye.

Hukûmet û meclîsa Kurdistana Iraqê îro menfeeta xwe di mayina "Hêza Çakûç" de dibî-nin. Ew jî zanin emperyalizm ci-ye û heta nuha ci anîye serê wan û serê Kurdistânî. Di vî warî de ne hewceye meriv zêde

Dûmahîk r. 11

### Hijmara "Hêza Çakûç" û ciyê wan:

Hejmara leşkeran: 1862

Li gor welatan:

DYA: 1466

İngilîstan: 183

Fransa: 139

Tirkîye: 74

Belavbûna wan li gor hêrêman:

İncîlik (Edena): 1803

Pîrinçlik(Diyarbekir): 49(Tirkîye: 6, İngilîstan: 2, DYB: 41)

Zaxo: 10 (DYB: 5, İngilîstan: 2, Fransa: 1, Tirkîye: 2)

Hejmara balafir û helikopter:

77 balafir û helikopter

DYA: 13 kargo, alîkar û tanker (C-12, C-212, HC-130, AWACS, KC-135)

9 Helikopter(UH-60, MH-53)

32 balafir û şer(A-10, F-16, F-111F, EF-111)

İngilîstan: 8 balafir û şer(jaguar), 2 balafir û tanker(VC-10K)

Fransa: 8 balafir û şer(F-1CR), 1 balafir û tanker(C-135FR)

Tirkîye: 4 balafir û şer(F-16, F-4)

(Rojnameya Cumhuriyet 4 Kasim 1992)

Serneweyê şima pîroz bo!

Sala we ya nû pîroz be!

Salî nwêtan pîroz bêt!


**ARMANC**



RÜPELEK JI GANDA ME A ROJANE

Dr. Emîr Hesenpûr:

**"Divê azadiya her lehçeye hebe"**



Hevpeyvîn rûpel 6-7

M. Lewendî:

**"Em jî nebin wek Ibixan?"**

rûpel: 4

H. Mizgîn:

**Kurd û realîstbûn**

rûpel: 3

**"Cesaret" û "Zanîn"**

Em insan gelek caran di axaftinê xwe de tekiliye-kê dixin navbera peyva "cesaret" ê û ya "zanîn" ê. Gelo tekiliye çawa di navbera van herdu peyvan de heye? Carna wiha lê tê ku em dibêjin "cesareta medeni ji zanîna medeni tê." Mahna xwe, yekî ku di têgihîştina medeniyetê de nezan be, ji cesareta medeni ji bêpar e, di kar û bar û bir, baweriyên xwe de newêrek e. Heke em bala xwe bidinê, em dikarin gelek nimûnan li ser vê yekê ji civakê, ji jiyana xwe û ya derûdora xwe binin. Li Kurdistanê em gelek caran bûne şahidê wê yekê ku serokesir, axa yan muxtarekî gund ku eşirekê yan çend gündan idare dike, serokê civakekê ye, bi şev û roj bîryaran li ser qedera insanê xwe dide, gava rastî du cendirmân û çawîşkî ordiya Tîrk hatîye dest û lingên wi li hev geriyane.

Li ali din, car ji heye ku em tekiliyeke wilo dixin navbera peyva "cesaret" ê û ya "zanîn" ê ku bi tevayî ziddê nimûna jorin e. Em dibêjin "cesaret" ji nezanîne yan ji ehmeqîye tê." Heke meriv bifîkire meriv dikare gelek nimûnan li ser rastiya vê gotinê ji ji jîyanê bine.

Çawa dibe? Ev "cesaret" ci tişt e ku hem "zanîn" hem ji "nezanîn" dikare bîbe sebebê wê? Ji bo meriv karibe xeleka navbera van herdu hukmîn ji hev cuda xwuyayı biqefèle, divê meriv berê bala xwe bidê, ka "cesaret" ci ye. Pişt re were ser wê yekê ka gelo "zanîn" û "nezanîn" li ku ji hev vediqetin.

"Cesaret" çiye? Cesaret "wérin" e. Divê meriv bîwêre. Lê ci biwêre? Divê meriv biwêre "bike", "bifîkire", "biparêze". Ne bes ev, divê meriv karibe di kirin, fikirin û parastina xwe de bi israr be. Lê li alî din divê meriv biwêre "bibine", "nas bike" û ji a xwe vegere ji. Yekî ku di çewtiyên xwe de israr dike, dinya çend du-guhere ji li ser şopa xwe ya berê dîmine, xwe naguhere û nuh nake, ne ku bi cesaret e lê newêrek e. Gava meriv bi çavêki wiha li mesela "cesaret" ê temâse kir, eske-re ye ku ne wiha hêsan e ku meriv karibe zû bi zû nimûnê jîyanê yê berbiçav di warê "kirin", "nekirin", "parastin", "israri" û "jê vegeryanê" de bike nişana cesaret an newêrekiya keseki. Kijan israr cesaret e û kijan newêreki ye, wê çawa ji hev bê vegetandin? A di vir de xuya ye ku tekiliya "cesaret" ê bi "zanîn" e re peydâ dibe.

Gelo zanîn ci ye? Heke bi çend peyvan be meriv dikare zanînê wiha tarîf bike: Zanîn nasîn e, têgihîştin e. Lê xeta navbera nezanîn û zanînê ji ku dest pê dike û heta ku dice, hidûdê navbera nezanîn û zanînê li ku diyar dibe ev her du mefhûm li kijan nuxte ji hev vediqetin? Diyarkirin û zelalkirina van aliyen meselê ne ew çend diyar e. Loma ji em di civakên xwe de bi hezaran nimûnen wê yekê dibîtin ku insanê nezan di nezaniya xwe de çend xurt be ewqas xafîle nezaniya xwe ye, xwe zana dibîne, tiştê ku dizane ji wi tire dinya hemû ji wê pêk hatîye. Li aliyê din insaneki ku di nasîn têgihîştin û zanîna xwe de çiqas kür biçe ewqas pirtir pê dihesê ku li derveyî zanîna wi, dinya ku ji wi nenas e çiqas sîreh e, li gor vê dinya nenas zanebûna wî çend hindik e. Loma ji ev zanebûn li nik yê filozof gîhastîye wê nuxte ku gotiye: "Tiştê ez dizanîm ew e ku ez tiştîki nizanîm."

Nexwe xeta navbera zanîn û nezanînê xetek wisa ye ku nezan xwe "zana" û zana xwe "nezan" dibîne. Gelo ne ev herdu rewş bin ku dibîn sebebê nimûnê cesareta ku me di destpêkê de bahs kirin? Yani cesareta nezanîn xwe zana dîti û ya zaneyê xwe nezan dîti...

Em Kurd iro geleki muhtaci wê yekê ne ku vegeerin ser mesela "cesaret" û "zanîn" ê û mesela tekiliya wan, munaqeşe bikin, têgihîştina xwe ya li ser van mefhûman nuh bikin.

# Şerê Yûgoslavayê nehîst Mesela Kurd têkeve rojeva KEHE'ye

**Rêxistinê  
Kurdan û komî-  
teyên piştgiriya  
Kurdan ji bes-  
darî civinê bûn.**

Di 14 û 15'ê Çileya Pêşin de li Stockholmê civîna Konseye Weziran ya Konferansa Ewlekarî û Hevkariya Ewrûpayê (KEHE) çêbû. Ji Azerbeycanê bigre heta Kandayê delagasyonê 52 dewletan besdarî civinê bûn.

Di civîna KEHE de 15 xal hatin munaqesekirin. Pîrsa Yugoslavayê û pîrsa avakirina struktur û berpirsiyariyên du komisyonan (Komisyon Parastina Aqeliyan û Komisyon Çareserkirina Nakokiyân bi aşî) xalên sereke bûn.

Di civinê de ji bilî delegasyonê fermî yên dewletên endam, nûnerên rêxistinê ne girêdayî dewletan ji bi raporen xwe besdarî civinê bûn. Federasyona Komelân Kurdistanê li Swêdê bi delegasyonekê ku ji Vildan Tanrikulu, Ahmet Karamus û Mahmud Kiper pêk hatibû besdarî civinê bû. Xeynî Federasyonê, Komeleya Navnemewî ji bo Mafê Mirovan li Kurdistanê, Komita Swêdî ji bo Mafê Mirovî yên gelê Kurd, Komita Piştgiriya Gelê Kurd ya Norveçê, Fonda Piştgiriya Kurdistanê bi nûner û raporen xwe bi besdarî civinê bûn.

Federasyona Komelân Kurdistanê li Swêdê, raporek ku ji hin peymanen navneteweyî li ser Kurdistan û belgeyên li ser hovîtiya dewleta Tîrkiyê li hember gelê Kurd gihadîn nêzî 30 delegasyonên dewletan. Federasyona Kurdan di rapora xwe de bangî KEHE dike û wiha dibêje: "Divê KEHE li hember Tîrkiyê hin tedbiran bigre da ku hebûn û mafê mirovî yên Kurdistan û her wisa mafê wan yê tayînkirina qedera xwe bi destê xwe bê nasîn û li gor prensibên ku ji aliyê KEHE ve hatîye qebûlkirin, di sewiya netewî û navnetewî de gelê Kurd bibe xwe-



diyê garantiya parastina huquqî ya mafênen xwe."

Her wisa bi daxwaznameya hevbeş ya 15 hêzen siyasi ji, bala besdarîn KEHE tê kişandin ser erîşen Tîrkiyê li başûrê Kurdistanê

û hovîtiya wan li bakurê Kurdistanê û tê diyarkirin ku divê pirsa gelê Kurd li Tîrkiyê û Tîrkiyê bi xwe têkeve rojeva KEHE, berî ku Kurdistanâ Başûr û Bakur bibe Yûgoslavake nû.

KEHE platform yan ji rêxistîneke navdewletî ye ku di dawiya salên 1960'an de pêvajoya pêwendiyêni navbera Pakta Warşova û dewletên Ewrûpayê de li ser ewlekarî ya li Ewrûpa hatîye damezirandin.

Peymana girîng ya KEHE di meha Tebaxa sala 1992'an de li Parisê hat imzekerin û bi navê "Şertîn Parisê" tê nasîn.

Prensibên KEHE ev in:

- 1- Mudaxelenekirina nav kar û barê dewletên serbixwe
- 2- Ji tehdît yan ji erîşkariyê xwe dûr xistin.
- 3- Hurmetgirtina hidûdan.
- 4- Hurmetgirtina sînorê dewletan.
- 5- Bi aşî çareserkirina nakokiyân.
- 6- Mudaxalenekirina pîrsen navxwe yên dewletan.
- 7- Hurmetgirtina mafênen mirovan û azadiyê bingehîn ku aza-diyan fîkrî, wîjdan, dîn û bawerî di nav de ne.
- 8- Wekheviya mafênen gelan û mafê çarenivîsê.
- 9- Hevkariya nav dewletan.
- 10- Bicîanîna berpirsiyariyên li gor huquqa navneteweyî.

**Armanc**  
Rojnama Kurdi ya mehane  
Monthly Kurdish Magazine

**Redaksiyon:**

M. Eli  
Zinarê Xamo  
Hesen Mizgîn  
Mîrza Bextiyar  
Lewend Firat  
S. Rêving  
M. Lewendî  
**Redaktör berpirsyar:**  
M. Eli  
**Berpirsiyare beşê**  
**Dimîlkî:** Malmîsanîj

**Adres :**  
Box: 152 16  
161 15 Bromma  
Sweden

**Telefon**

46-8-803135

**Telefax:**

46-8-801825

**Utges av:**

Kurdîska

Demokratiska

Arbetarunionen

Postgiro: 50 37 99-9

ISSN: 0348 7385

**Abonefi**  
Prenumeration  
Abonetiya Salekê  
Li Skandinaviya

200 SKR

Megam

Myndigheter

400 SKR

Li Ewrûpa

50 DM

Li derveyî Ewrûpa

40 \$

Anons/ilan

nîv rüpel/ en halvsidan  
2500 SKR

# Dewleta Tirk Gundêñ Kurdan wêran dike

Roj derbas nabe ku leşker û cendirmêñ dewleta Tirkîyê neavên ser gundekî û gund wêran nekin. Li gor dîtina dewletê gundêñ hudûd û çiya çavkaniya alîkariya PKK'ê ne û gava gundiyan van gundan "Milisiya Gundan" qebûl nekin, divê gundêñ wan bêñ wêrankirin.

Gundêñ ku van mehêñ dawiyê "nasîbîn" xwe ji vê terora dewletê girtine, gundêñ derûdora Pasûrê (Kulp'ê) ne.

Piştî ku gundiyan Tiyaxsê (Narlica) daxwaza dewletê ku divê ew bibin "Milisî Gundan" qebûl nekin, dewletê bi top û helikopterên xwe di 28'ê Çîriya Paşîn de êrîşêk mezin bir ser gund. Di êrîşê de hemû xanî yek bi yek hatin saxîkirin, gelek heywan hatin telef kirin û gelek xanî jî wêran kirin. Bi vî hawî zerareke mezin dan gundiyan.

Li ser vê bûyerê em çûn gund û me bi gundiyan re qise kir. Gundiyeñ digot; him mala min, him jî imbara min a zexîrê şewitandin, pênc ton tutûna min



şewitandin." Gundiyeñ din Aziz Tanrikulu xwediyê aşekî bûye û aşe wî ji şewitandine. Li gor A. Tanrikulu ew genimê ku gundiyan ji bo hêranê anîbûn aş giş şewitandine û zêdeyî 100 milyonî zerar dane wî.

Gundiyan wek Cemil İpek, Gafur Memiş, Fehmi Guler û Aziz Ozbay jî zerarek mezin dîtibûn. Zerara wan jî nêzî milyarek bû.

Piştî vê operasyona dewletê,

gelek gundiyan Tiyaxsê ji gund bar kirin.

Operasyona dewletê tenê li Tiyaxsê nema. Gundê ciranê Tiyaxsê Huruç (Kaynak) ji şewitandin. Gundê Babıca (Savaşkan) ji vala kirin. Tade û zilma dewletê li ser gundê din jî yên Pasûrê zede ye. Ev zilm wisa bûye ku, gundi mecbûr dibin, gundê xwe terk bikin û berê xwe bidin bajaran.

Vahit Aba/Diyarbekir

## Li Kurdistanê şerê psîkolojîk

Li gor hin rojnamen Tirkan, piştî avakirina "Daîra Şerê Taybetî" niha jî bi navê "Daîra Şerê psîkolojîk" daîreyek nuh di nav emniyeta Tirk de hatiye avakirin. Ev daîre wê li Kurdistanê, li der û li hundur li hember hêzên Kurd şerê psîkolojîk bimeşîne.

Wek ku tê zanîn, ev şerê psîkolojîk berê jî hebû û bi armanca ku hêzên Kurdistanê berra hev de car carna hin beyan jî belav dikirin.

Lê welê xuya ye ku ev şerê psîkolojîk wê ji

nîha şûnde hîn bi organize bê meşandin. Dema ev nûçe di rojnamen de derket du belavok ketin destê me ku yek li ser navê PSK (Partiya Sosyalist a Kurdistanê) û yek jî li ser navê PKK- Vejin hatibû belavkirin. Û di belavokan de PKK wek dijmin tê nîşandan. Ya li ser navê PSK'ê ji Almania, ji bajare Kolnê, ya din jî ji Hekkarîyê hatibûn şandin.

Eşkere ye ku dewleta Tirk dixwaze nakokiyê têxe navbera hêzên Kurd. Divê hemû hêz û kesenî welatparêz li hember van dek û dolabêñ dewleta Tirk hişyar bin.

## Bi kurtî meha buhuri

Diyarbekir:  
**Talaneke nuh  
ya çandî**

Wezareta Çandî ya Tirkîyê bîrjar girt ku 1954 eserên dest-nîşî yên dînî û edebî ku di sed-sala 9'an de hatine nîşîn ji kutubxana welayeta Diyarbekir veguhêze kutubxanê Ankara û Konyayê.

Ev bîrjar li Diyarbekir bû sedemê reaksiyonên nexweşîyê. Xelkê Diyarbekir li hember vê bûyerê telgrafê protestoyê rîki-rin. Xwendevanê Unîversiteya Dîcleyê reaksiyonên sert dan nîşandan. Rojnama herêmî ya "Diyarbakır Söz" ji bona ku ev bîrjar pêk neyê mahkeme vekir.

Diyarbekir:  
**Terora  
li Kurdistanê jiyana  
ticari dikuje**

Terora ku li Kurdistanê dom dike, tesîreke mezin li ser jiyana ticarî jî dike. Şirketên ımalatê wek berê bi taksîda mal nafiroşin esnafêñ Kurdistanê. Gelek kêm şirket bi taksîda difroşin, ew jî di-din muşteriyê xwe yên kevin. Îmkana esnafênuh qet tuneye ku mal bi taksîda bikirin.

Di vê salê de ji endamên sa-

nayî û tîcâretê 220 kes ji komelê qeydîn xwe xera kirin û ji endamên nuha qismek mezin nikarin endametiya xwe bidin.

Anqere:  
**Hay ji memûren  
Kurd hebin!**

Muduriyeta Parastina Serokwezîriyê ji hemû mudurên parastinê yên wezaretâ re û muduriyeten taybeti re nîvîsek şand. Di nîvîse de tê gotin ku we hay jê hebe ku PKK li hember we-ziran dest bi suîkasta bike.

Hewlîr:  
**Bombeyen Sedam  
û alîkariya însanî**

Di meha Çileya Pêşin de 14 kamyonên alîkariyê dema ku dijûn Kurdistanê Iraqî infilaq kirin. Derhal derket rastê ku ew bombe dema ku konvoy di erdêñ destê Iraqî de derbas dibûn, ji aliye leşkerên Iraqî ve dihatin bi cî kirin. Li ser vê bûyerê Yekîtiya Netewan neqliyata alîkariyê roja 19.12.1992'an de, da sekînandin. Lê dirêj najot, piştî 5 rojan alîkariyê disa dest pê kir.

## Dewleta Tirk li Strasburgê tê mahkemekirin

Li ser daxwaza gundiyan Cinebirê (Yeşilyurt) dewleta Tirk wê roja 12'ê Çileya Paşîn de li Strasburgê derkeve pêşberê mahkema navnetewî. Wek tê zanîn di 14-15'ê Çileya Paşîn a sala 1989'an de hêzên dewleta Tirk bi zorê pîşîtiya însan bi gundiyan Cinebirê dabûn xwarin. Gundiyan li Tirkîyê ji bo ku berpîsiyaren vê kirya-rê bêne cezakirin li mahkema Tirkan dawe vekiribûn lê, mahkemê cendirme bê súc îlankiribûn. Li ser vê, gundiyan mureceetê meh-kema navnetewî kiribûn.

Mehkemê bîrjar da ku di 12'ê Çileya Paşîn li vê dawê binêre.

Komîta Piştigiriya Cinebirîyan, bi piştigiriya HEVKAR, KOMKAR, KKP, Hevgirtin-PDK, HEVKARI û Kom-Makê belavokek û afîsek derêxistî û ji Kurdan daxwaz kir ku beşdarî meşa ku wê roja 11'ê Çileya Paşîn li Strasbourgê, li ber deriyê mahkemê bêkirin, bikin.

**NEYLIK**

## KURD Û REALİSTBÛN

Hesen MIZGİN

Di her sersala nuh de em Kurd tim û tim hêviya xwe ya pîrozkirina sersaleke nû li Kurdistanê azad tînin zimên. Hêvî û daxwaz divê di dilê me de tim û tim hebin, bêyî wan jiyan ji bo min vala ye, bê naverok e, pûç e. Lê belê hêvî û daxwaz divê di gotinan de nemîne, di sohbetan de nemîne, divê bikeve jiyanê da ku bibin xwedî karekerekê. Hêzên li Kurdistanê federal ji vi alî ve gihiştine merhalek, gelek girîng û hêja. Daxwaz û hêviyên wan bi qismî be jî bi cih hatine. Hêvî û daxwaza min ew e ku Hukumeta Kurdistanê Federal di siyaseta xwe da realist be, li gor rastiya xwe hereket bike.

Di destpêka sala nû 1993'an de hêvî û daxwazek min jî ji hêzên Kurdistanê bakûr heye; perspektîfa me bila ji welatê me dest pê bike. Xeyal û fantezî hew kérî gelê me tê. Rastiya gel û welatê me ci be, divê siyaseta me, programa me jî li gor wê be. Bi gotineke din divê em realist bin da ku em bikaribin rastiya xwe bibînin. Baş e realistbûn û rastiya me ci ye.?

1. Hêzên Kurdistan a İraqê, İranê û Suryê ji mîj ve ji roja ku partî yan jî rîexistinê xwe ava kirine rastikeke xwe anîne zimên. Ji Kurdistanê Tirkîyê KDP û PSK ev rastî anîne zimên. PSK di vî warî de realistbûna xwe didomîne, lê KDP hezar mixabin ku bi "Hevgirtinê" ji rastiya xwe dûr ket. Daxwaza "Kurdistan Serbixwe" do çiqas xeyal bû, iro jî xeyal e. Daxwaza "Otonomi", "Federasyon" an jî "Konfederasyon" daxwazeke realist e.

Sînorêñ ku Kurdistanê me kirine çar perçe me bivê nevê bûne rastikeke dîrokî. Hilweşandina van sînoran, guherandina xarîta Rojhîlata Navîn tîne rojeyê. Ev yek jî bi ya min ne realist e. Ne dewletêñ li der û dora Kurdistanê vê yekê qebûl dîkin û ne jî dewletêñ di "pergela nû ya dinê" de xwedî soz û qewet in. Vê yekê qebûl dîkin. Di pîrsa "Otonomi", "Federasyon" an jî "Konfederasyon" de serê min ne zelal e. Di vî warî de bêşik munaqeşe divê.

2. "Di pergela nû ya dinê" de cih ji şerê çekdaryê re ne-maye. İro roj roja bi hevdû re rûniştinê ye, kompromîsa ye. Ji ber vê yekê jî bi ya min a rast xebata siyasi û demokratik e. Ji dîlva ku em xwe bi xwe bi nîşandana hedefa şerê çekdaryê bixapînîn û xeyalan bikin, em dikarin li her aliyê dinê ku Kurd lê hene avahiyêñ demokratî damezirîn, lobiyêñ Kurda biafirîn, siyasi û zanyarêñ Ewrûpî bikin dost û hevalêñ Kurdan. Di vî warî de du nimûneyêñ pir balkêş hene: Yek Federasyona Komelêñ Kurdistanê li Swêdê û ya du ya jî Enstitûya Kurd li Parisê ye. Xizmeta wan di warê afirandina lobî û komîteyêñ ji bo piştigiriya Kurdan de bê hempa ye.

3. Fikra "Yekîti" idealeke baş e û eger di bingehêk realist de be, jê çêtir tuneye. Lê belê "Çi dibe bila bibe, lê bila yekîti çê bibe" Gotin û ji bo vê yekê xebatkirin ne rast e. Bi ya min yekîtiya kes, grûp, rîexistin û partiyêñ di xetêñ siyasi yên wek hev de rast e. Lê yekîtiya du xetêñ cûda xwe bi xwe xapandin e û tu feydê nade têkoşîna gelê Kurd.

Dîtin û siyasetêñ cûda cûda ji bo reqabetê, ji bo afrandînen nû pêwîstiyeñ e. Partiyek, siyasetek di eslê xwe de rejîmeke totalîtere. Rejîmên totalîter tu caran hurmetê ji azadiya însan re, ji mafê însanî re, ji kabiliyeta afrandinê re neki-riye û nake jî. Ji bo pêşdeçûna civakekê pirdengî wek nan û avê mecbûriyet e.

4. Kurdistanê me mîtingeha çar dewleta ye. Dijmin çarmedora Kurdistanê girtine û dema pîrs Kurd û Kurdistan be, herçar jî her çiqas dijmîntiye wan wan li dij hev du hebe jî tîn cem hevdû û bi hev re hereket dîkin. İcar dema rastiya me ya li ber çavan ev be, lêgerîna dijmînê din ci ye? Şerê li dij "Emperyalizma Emerîka" û "Emperyalizma Ewrûpayê" hem ji alî hedef nîşandanê û hem jî ji alî naverokê ve şaş e. Di vê de tu mesleheta gelê Kurd tune ye. İro kes û hêzên siyasi ku li dij hêzên Neteweyêñ Yekbûyi (Hêza Çakuç) radiwestin û dixwazin ku ji herêmê derkevin, herin ne realist in, ji rastiya welatê xwe dûr in û xizmeta dijmînê me yên li ber çavê meçar dewletêñ mîtingehkar-dîkin. Kes û hêzên di vê bawerîye de jî perspektîfa Kurd û Kurdistanî pirr dûr in, dijmînê xeyalî ew kor kirine. Jiber ku derçûna hêzên NY ji herêmê vekirina meydana qetikirina gelê Kurd e û ne tiştekî din.

## RAMANÊN RAMANWERAN

## Em jî nebin wek "Ibix"an ?

Milletek bi zimanê xwe heye. Wexta ku zimanê wî ji ortê rabe, ew millet jî ji ortê radibe, dihele, dimire, wenda dibe. Ji bo ninûna vê yekê jî di tarîxê de û iro jî gelek ziman hene. Gelek millet di tarîxê de çi bi zorê, çi jî bi xuzayî (tebî'i) be, pêşî zimanê wan, paşê jî ew bi xwe helyane, wenda bûne, bûne milletekî din.

Li Tirkîyê û li Kurdistana Bakur ji bilî Tirk û Kurdan gelek milletên din jî hebûn. Heta salên 1920'î Laz hebûn ku wextekê çi bigre dikira bibana dewlet. Lî iro giş bûne Tirk.

Li Hatayê heta Mersin û Antalyayê berê Ereb hebûn. Lî iro tenê li derdorêni Hatayê mane. Adana wextekê bajarê Ereb û Ermenîyan bû, lî iro bo nimûne jî nemane. Wan, Ağrı, Qers, hemû heta salên 1915'yi bajarêni Ermenîyan bûn, lî iro tu kes ji wan nemaye. Gerçî pişerîya wan hatin kuştin, lî yên mayî jî di nav civatê de helyan bûn Tirk û Kurd. Yanê wenda bûn.

Wextekê li Tirkîyê gelek milletên cihê-cihê yên Qafqasî hebûn, iro hîç nemane. Ne ku nemane, fêri Tirkî bûn, zimanê xwe ji bîra kirin û bûn Tirk.

Ger we bihîstibe, wextekê li Tirkîyê bi navê "Ibix" milletek hebû. Heta salên 1970'yi jî zimanek, kulturek wan hebû. Lî nuha? Tu kes ji wan nema. Mirovê wan ê herî dawîn ku bi Ibixî qise dikir, ew jî sê-çar sal berê mir û zimanê wan jî ji ortê rabû. Yanê Ibixî jî wek Sumerî, Hittîti, Latîni ket nav tarîxê.

**Eger em gundan hesab nekin, iro li bajaran keşen ku emrê wan di ser 30'yi re ne, bi Kurdî dizanî, lî nifşen din yan nizanî, yan jî zimanê wan ê yekem Tirkî ye. Yanê teqrîbi em dikarin bibêjin ku iro li Kurdistanê ancax 3 milyon Kurd bi Kurdî qise dikin.**

Heta salên 1960'î jî, %30'ye nufûsa Tirkîyê Kurdiyâfan bûn. Lî iro? iro meriv nikare bi bêjê %10'ê nufûsa Tirkîyê (Kurdistan jî tê de) Kurdiyâfan in (Ez nabêjim Kurd, lî Kurdiyâfan, yanê yên ku bi Dimîlî û Kurmancî qise dikin).

İstatistikkek saxlem di destê me de tuneye, lî bi qasî ku tê gotin li seranserê Tirkîyê û Kurdistana Tirkîyê nufûsa Kurdan di navbera 13-15 milyonî de ye. Li Kurdistanê nagihîje 10 milyonî. Bajar li ortê ne! Çend bajarêni me hene? Em bibêjin 19 bajar:

Dêrsim(Kurd): 152 248  
Diyarbekir(Kurd): 941 522  
Adiyaman/Semsûr(Kurd): 439 410  
Ağrı(Kurd): 430 843  
Van(Kurd): 573 801  
Bedîs(Kurd): 303 880  
Hekkari(Kurd): 187 413  
Bingöl/Cepexçür(Kurd): 248 849  
Mardin(Kurd-Ereb): 694 171  
Şırnak(Kurd-Ereb): 341 749  
Urfa/Ruha(Kurd-Ereb): 884 786  
Elazığ(Kurd): 493 952  
Muş(Kurd): 341 749  
Erzincan(Kurd-Tirk): 302 945  
Qers(Tirk-Kurd): 728 734  
Meletîye(Tirk-Kurd): 687 869  
Erzûrûm(Tirk-Kurd): 874 969  
Entab(Tirk-Kurd): 953 859  
Meraş(Tirk-Kurd): 856 000

Yekûn: 10 629 058

Li gor istatistikka jorîn\* nufûsa Kurdistanê diyar e. İcar eger em Tirkên bajarêni wek Entab, Meraş, Erzûrûm Meletîye, Qers û Erzincanê, Ereb û Suryanî û Azerîyên Kurdistanê û memûr û polis û hwd ên Tirk jî jê derxin, teqrîben nufûsa Kurdêni Kurdistana Tirkîyê dimîne 8 milyon. Ji ber ku di destê me de istatistikkek saxlem tuneye, dîsa li gor texmînên xwe gava ku em rewşa bajarêni wek Diyarbekir û Ruha û hîn gelekîn din dinêrin em dikarin bibêjin ku jî vî 8 milyonî ancax 6 milyon bi Kurdî (Kurmancî-Dimîlî) dizanîn. İcar jî vî 6 milyonê ku bi Kurdî dizanîn, gelo çiqasê wan bi Kurdî qise dikin? Ew jî ne dîyar e. Lî wek kesekî Diyarbekirî ez bi texmînî dikarîm bibêjin ku jî % 60'ê Kurdêni Diyarbekirê bi Tirkî qise dikin.


Eger em gundan hesab nekin, iro li bajaran kesen ku emrê wan di ser 30'yi re ne, bi Kurdî dizanîn, lî nifşen din yan nizanîn, yan jî zimanê wan ê yekem Tirkî ye. Yanê teqrîbi em dikarin bibêjin ku iro li Kurdistanê ancax 3 milyon Kurd bi Kurdî qise dikin.

Eger em rewşa Kurdistanê ya 5-6 salên dawîn jî bidin ber çavan ku ji ber terora dewletê û hêzîn tarî gelek Kurd ji Kurdistanê bar dikin, wê wextê ev hejmar hê jî dadikeve.

İcar li gel van hemûyan bi ser de % 98'ê rojname û kovarîn me bi Tirkî derdikevin. Kitêbîn ku li ser Kurdan in, an jî Kurd bi xwe dinivîsin %90'ê wan bi Tirkî ne. Rêxistin û organîzasyon û komelîn me di hemû civîn û semîner û kongre û faalîyetên xwe yên din de bi Tirkî dipeyivin.

Ü eger rewşa bi vî awayî biçê, li hember vê teknika komünîkasyonê ku iro dewleta Tirk bi kar tîne, pişti 15-20 salan li Kurdistanê nufûsa Kurdiyâfan wê dakeve sed hezaran û belkî jî nemîne, emê jî bibin wek "Ibix"an.

Felaketa mezin jî ew e ku



Mahmûd Lewendî

Milletek bi zimanê xwe neaxife. Ziman îskeleta milletekî ye. Bê ziman millet ji milletiyê derdi-keve dibe milletekî din. Yanê eger iro Kurdî tunebe, Kurd ji tuneye, Kurd nebe Kurdistan jî tuneye, wê wextê divê ku berî her tişti em pirsa ziman derxin pêş.

Çare

Rast e, ji bo çareserkirina wê divê ku em azad bin, lî bi a min li gor şertîn û, ji nuha de jî em dikarin hin tedbiran bigrin:

Mesela, hemû rêxistinên Kurdan; komele, parti, kovar, rojname ci dibe bila bibe, divê ku hemû fealîyetên xwe yên nivîskî û devkî bi Kurdî bikin.

**Eger rewşa bi vî awayî biçê, li hember vê teknika komünîkasyonê ku iro dewleta Tirk bi kar tîne, pişti 15-20 salan li Kurdistanê nufûsa Kurdiyâfan wê dakeve sed hezaran û belkî jî nemîne, emê jî bibin wek "Ibix"an.**

Li malê, li ciyê kar, li derive, li çayxanê, li kuderê dibe bila bibe, divê ku heta ji me were em bi Kurdî qise bikin.

Xwezîka iro ew rojname û kovarîn ku li Kurdistana Tirkîyê derdikevin: Medya Güneşî, Azadî, Yeni Ülke, Özgür Halk, Özgür Gündem, Komel, Serketin, Newroz, Newroz Ateşî, Govend, Felat, Rewşen hemû wek Welat û Nubiharê seranser bi Kurdî derketana!

Ziman zimanê me ye, eger em lî xwedî dernekevin; em pê nepeyivin, em pê nenivîsin û em pê nexwînin, tu maney-ekê welatperwerîya me namîne. Di nuxteyekê de em jî dîbin piştgirê wê siyaseta ku zimanê me jî ortê radike.

\* (Nufûsa bajaran yên sala 1985'an e û ji kitêba S. Aydoğduş-A. Nas; Kuzey Kurdistan'da Sosyo Ekonomik Yapının Niteliği Üzerine, 1990, Stockholm, r:180 hatine girtin)

Şîriyên me

Zinarê Xamo

Bersîvek mecbûrî

Çendekî berê profesorekî Tirk, Adnan Tekin kitêbeke ali-mekî Ingiliz (F. B. Pickering) wergerandibû Tirkî û wek ku wî nivîsandibe dabû weşandin. Pişti ku ev yek eşkere bû, tavilê ji wezîfa xwe (ji Ünîversîta Teknikê ya Stenbolê) istifa kir.

Ma li ba me jî wiha ye? Helbet na. Numûne pir in. Hema heta nuha min navê 6 kesan eşkere kirin, lê ji wan yek jî hîn ji kovar û rojnameyên ku ew tê de dinivîsinin nehatine bi dûrxistin û ji popularîta wan jî tiştek kêm nebûye, tew di ser de ew min rexne dikin, bi rûpelan nivîsan li ser min dinivîsinin. Ji wan biraderan yek jî navê wî X. Lezgîn e.

Di rojnama Azadî hejmara 1'ê de nivîseke X. Lezgîn li ser Mestûre Xanimê derektibû. X. Lezgîn di vê nivîsê de hin perçe ji kovara Svensk Kurdisk Journal (ji nivîsa E. Vasilieva) gitibû û çavkanî jî nîşan nedabû. Min di wê nivîsa xwe de (Armanc, no: 129) li X. Lezgîn û li dizeki din (D. Dogan) rexne girtibû, gotibû ku ev tişteku hûn dikin ne rast e. D. Dogan deng jê derneket, lê X. Lezgîn ji vê ifşakirina min gelekî aciz bûye, rabûye di kovara Roja Nû de (no: 35, r. 24-25) bi nivîseke dirêj bersiva min daye.

Heger wî di nivîsa xwe de pozbilindî û gelek gotinê pêşde û paşde nekiriba minê hewcîyî vê nivîsê nedîta. Lî pişti wan gotinê wî yên bi tinaz, nedibû ku ez vê nivîsê nenivîsinim.

X. Lezgîn dibejê "di Kurmanciya jorî de kesen rexneyen edebî dikin gelekî kêm in û di nav yên heyî de jî hin kes hene ku ne ji bo xizmeta ziman û çandê, lê ji ber zikreşî û çavnebariya xwe" vî karî dikin. Bêguman ew kes jî ez im. Yanî gava yek li keda xelkê xwedî derkeve, nivîsên xelkê bidize ev ne súc e û ne jî kîmasî ye, lê gava ez diziya wan derxim ez dibim "çavnebar, zikreş û hesûd" (!) Fena ku X. Lezgîn ji min re bibêjê:

- Tu ci çavnebarî û hesûdîyê dikî, nivîs pir in, tu jî dikanî ji xwe re bidizî. Tu çima çavnebarîyê dikî?

Birayê ezîz, bi rastî dilê min qet nabije karê we û ez hesûdî û çavnebariyê jî nakim. Ez ji alî ehlaqî ve diziya nivîsên xelkê rast nabînim û loma jî car carna vê yekê rexne dikim. Di vê şela min de tu "çavnebarî, zikreş û hesûdî" tuneye.

Ya din, ne kesen ku heta nuha min navêwan dane hemû edib in û nivîsen edebî nivîsine û ne jî ez di vî quncikî de rexneyen edebî dikim. Ez bi piranî fiqreyen mîzahî dinivîsim û di van nivîsan de jî yekcarna navêwan kesen ku nivîsên xelkê dîkin malen xwe, eşkere dikim. Wer xuya ye ku tu van meselan hîn baş nizanî.

Li gor X. Lezgîn, nivîsa wî nivîseke gelekî kin e, ne lê kolîneke akademik e, ew bi armanca agahdarî û propogandayê hatiye nivîsin. Ji bo ku xwendevan bizanibin "ku di filan wextê de bi filan navî jineke Kurd hebûye û wê helbest û dîrok nivîsiye û di filan wextê de li filan derê mirîye".

Baş e, ji bo tiştekî wiha nedivê te tarîx û şîriyên Mestûre Xanimê xwendibin? Em dizanîn Mestûre Xanimê bi Farisî û bi Goranî nivîsiye. Gelo tu bi Farisî û Goranî dizanî, te berhemên wê xwendine? Heger te kaniba bixwenda ya ji ew xwendibana te yê kopya nekira. Ma kopyekirina nivîsen ji bo agahdariye serbest e? Pişti ku te berhemên wê nedîtine û nexwendine tu çawa dikanî bibêjî Mestûre Xanimê nizanîm 20.000 beyt nivîsine, nizanîm şîriyên wê li ser evîn û li ser jina ne. Ma te beytên helbesten wê jimartine? Ma yek rabe çewtiya vana derxe, tu yê bêjî ci?

Helbet ev nayê wê manê ji bo ku meriv tiştekî li ser berhemekî, binivîse divê meriv muheqeş wê bixwîne. Na, meriv dîkane ji xelkê jî bigre, lê wê gavê jî divê meriv çavkaniyê nîşan bide. Gava ne wiha be wê gavê herkes wê ji xwe re ji kitêbekê, ji maqaleyekê hin besan bigre û navê xwe li binî binivîsine.

X. Lezgîn dibêjî nivîsa E. Vasîlievayê 9-10 qatan ji ya wî dirêjtir e. Ji ber vê yekê jî divê min negotâ ku X. Lezgîn diziye. Li gor vê pîvana X. Lezgîn, gava ku meriv hindikî bidize ev ne dizî ye, ji bo ku bibe dizi divê meriv nivîsê bi tevayî bigre. Yanî divê meriv devê tevî hawud daqultîne.

X. Lezgîn ji bo ku diziya xwe normal nîşan bide, dibêje nizanîm Yehya Marifat, Prof. Şakirê Xudo û hinê din jî tişten nîşî hev gotine, lema jî pir tabî ye ku tespîten X. Lezgîn ji wek yên E. Vasîlieva bin. Heval, ma tu bi Kurdî fahm nakî? Ez dibêjim te Mensûre Xanim nexwendîye. Lema jî tu dîtinek te tuneye, ew tişten ku te gotine tesbîten xelkê ne. Ew kesen ku tu qal dikî heger hin tişten nîşî hev gotibin jî muheqeş wan Mensûre Xanim xwendine. Ne ku ew jî wek te, çûne ji nivîsên xelkê girtine û bêyî ku çavkaniyê nîşan bidin navê xwe li binî nivîsine. Heger wiha nekîribin kirina wan jî çewt e, divê meriv wan jî rexne bike.

X. Lezgîn ji bo ku kanibe min rexne bike xwe gelekî êşandiye, tu bigrî hema secerâ min derxistiye, min bi ci navî, li ku derê ci nivîsandibe giş yek bi yek kontrol kiriye.

Ü di dawiyê de wî jî du "diziye" min tesbît kirie. Yek jê, Dûmahîk r. 9

# Saleke Kurdan weha derbas bû

Sala 1992 bi bûyer û guherti-nêñ xwe wê di dîroka gelê Kurd de bibe saleke diyar. Hin gavênu di vê salê de hatin avêtin wê bibin çeperên daîmî yê destkefti, wê ev sal li ser navê Kurda bibe saleke xuyayî di dîroka siyasi û cografik ya dinê de jî.

Bêşik bûyera salê ya heri girîng çêbûna hilbijartînê giştî, avabûna parlamentoaya Kurdî û bi destê vê parlamentooyê îlankirî-na dawleta Kurd a federe bû. Hêjî deng û reaksiyonêñ vê bûyerê li herêmê û li dînyayê olan didin.

Bûyerek din ku bû sedemê kîfîxwesiyyê, avêtina hin gavênu girîng ber bi dagirtina valayıya siyasi li Kurdistana Tirkîyê bû.

Sê hêzên Kurd gihîştin hev, bûn yek hêz û navê xwe kirin YEK-BÜN. Du-sê meh piştî vê yekîtiyê hin grub û hêzên Kurd hatin ba hev PDK-Hevgirtin hat damezrandin.

Bûyera heri xerab ya salê, gerê birakuijîyê bû. Dewleta Tirk jî ev fîrsend berneda, êrîş bir ser kam-pêñ PKK'ê.

Her wisa 1992'an, bi şehîdbûna Dr. Saïd Şerefkendî û 3 kadirêñ bijarte yêñ PDK'ê wê di hafiza me de bimîne.

Terora, dewleta Tirkîye ya li hember gelê Kurd di sala 1992'an de qat zêde bû.

Zelzela Erzîncanê bi sedan can girtin.

## Hilbijartin, Parlamento, û îlankirina dawleta Kurd



Foto: S. Zirek

Piştî têkoşîneke 30 salan û qetliamêñ mezin, Kurda cara pêşin ji 6/5'ê Kurdistana Iraçê kîrin bin kontrola xwe û di dîroka Kurdan de cara pêşin ji bo xwe bi xwe idarekirinê deng dan. Di 19'ê Gulânê de him ji bo parlementoyê, him jî ji bo serokatiya tevgera Kurdistanî hilbijartînê çêbûn. Ji bo dengdana serokatiyê 982.649 kesî dengê xwe dan. Jî namzatan yekî jî ji sedî 50'yî zêdetir deng negirt.

Di hilbijartina parlamentooyê de 971.953 kesan deng dan. PDK ji sedî 45.26, YNK û Partiya Zehmetkêşanî Kurdistan ji sedî 43.81, Tevgera İslâmî ji sedî 5.08, PASOK û Partiya Sosyalistî Kurdistan ji sedî 2.57. Partiya Komunîst a Iraçê (Seksiyona Kurdistan) ji sedî 2.18 û Partiya Demokrat a Gelê Kurdi-

stan jî ji sedî 1.02 deng girtin.

Li gor encama hilbijartînê ji lîsta PDK 50, ji lîsta müşterek ya YNK û PZK 50 û ji lîsta kontejâna ya Asûriyan jî 5 kes ketin parlementoyê. Roja 04.07.1992'an hukumeta Kurd ava bû. Hukûmet ji 15 wezîran pêk tê. Ji bo serokatiya parlamentooyê Dr. Cewher Namik, ji bo serokwezîriyê Dr. Fuad Mahsûm hatin hilbijartin.

Roja 4'ê Çiriya Pêşin Meclisa Netewî ya Kurdistana Başûr bi tevayiya dengan Dewleta Federe a Kurdistanî ïlan kir. Li gel an li hember îlankirina Kurdistana Federe, dewletê mîzin deng nekîrin, lê dewletê ku Kurdistan iş-xal kirine nerazibûna xwe eşkerekirin û di seviya wezîren derive de, di nav xwe de civînek çêkirin.

## YEKBÛN, HEVGIRTIN-PDK

Îsal hêzên siyasi yêñ Kurdistana Tirkîyê, ber bi civîyan û xurtbûnê de gavênu girîng avêtin. Du yekîtiyêñ siyasi çêbûn û gelek hêzan jî kongrêñ xwe çêkirin.

PPKK (Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdistan), KUK-SE (Rizgarîxwazî Netewî yêñ Kurdistanî-Meyla Sosyalist) û KAK (Komela Azadiya Kurdistanî) di meha Hezîranê de li Kurdistanê bi besdariya nûnerên her sê hêzan bi kongreyekê yekîtiya xwe ya siyasi çêkirin. Navê partiya nuh "Partiya Yekbûyî ya Gelê Kurdistanê" (YEKBÛN) e.

Partiya Demokrat a Kurdistana Tirkîyê, Platforma Yekîtiya Ala Rizgarî, Platforma Yekîtiya Netewî ya Kurdistanê, komek ku ji Rizgarîyê vejetiyane û hin kadirêñ serbixe di meha Çileya Pêşin de kongreyek müşterek çêkirin û "Hevgirtin-Partiya Demokrat a Kurdistanê" damezrandin.

Di 6'ê Çiriya Pêşin de li Kurdistana Başûr di navbera hêzên hukumeta Kurdistanê û gerîllayen PKK'ê de şer derket. Hin jî ne diyar e ku di vî şeri de ji her du aliyan çiqas kes mirine. Bi peymanekê PKK'ê şertîn hukumeta Kurdistanê qebûl kirin û şer rawestiya. Lî Tesîf û xesareta şerî Hukûmeta Kurdistanâ Başûr û PKK'ê, wê bi sala 1992'an nemîne. Ev sal wê wek sala 1978'an neyê jibîrkirin.

Dewleta Tirk jî ji vî şerî navxweyi feyde girt, êrîş bir ser PKK'ê. Êrîşa xwe heta nav Kurdistanâ Iraqê domand.

## Şerê hukûmeta Kurdistanê û PKK'ê



Foto: Ümit Turpçu

## Kuştina Dr. Şerefkendî

Şeva 17'ê Îlonê li Berlinê Sekreterê Giştî yê Partiya Demokrat a Kurdistanâ Iranê Dr. Saïd (Sadiq) Şerefkendî û endamê Komîta Merkezi û berpirsiyare Ewrûpa Fettah Abdülî, berpirsiyare Almanya Hamuyun Ardalan û Nûrî Dehkurdî ji aliyê sê kesan ve hatin kuştin. PDK'ê, Iran wek mesûla vê cînayetê ïlan kir. Polisê Alman bi şika ku teví qetliamê bûne 2 Lubnanî girtin. Li gor malûmaten ku me ji PDK-î girtin, hîn jî ew kes girtî ne û şik tê kirin ku du diplomaten Iranî teví vê cînayetê bûne.



Foto: Armanc

## Teror û cînayetên dewletê



Di sala 1992'an de dewleta Tirk teror, cînayet, zulm û zora xwe ya li hember gelê Kurd qat qat zêde kir. Bi sedan gund şewitandin vala kirin. Bi hezaran kes hatin girtin. Li gor rapora Komela Mafêñ Mirovî di sala 1992'an de di işkence û infazên bê mahkeme de 1041 kes hatin kuştin.

### Kesên wenda û yên di işkencê de mirine

Di sala 1992'an de kesên ku hatine girtin û tu xeber ji wan tune ye 20 in û navêwan Yusuf Erişti, Huseyin Toraman, Husamettin Yaman, Soner Gul, Huseyin Gulunay, Ayhan Efeoglu, Tugrul Ozbek, Mehmet Demir, Durmuş Çaylak, Mahmut Ertak, Nezîr Acar, Sadık Alkamış, Erkan Ersoy, Şehmuz Aydin, Ahmet Koşmat, Ahmet Ballica, Ahmet Aktan, İbrahim Arslan, Duran Yıldırım, Ziyaettin Altınok,

Mustafa Laçin û Yavuz Deniz in.

21 kes jî di işkencê de hatin kuştin. Ew jî ev in: Remzi Basalak, Tahir Suday, Abdulrakip Akin, Burhan Serikli, Zekî Bolçun, Bîşeng Anik, Abdulkadir Kurt, Mîhat Kutlu, Agît Salman, Mehmet Yilmaz, Ali Ekber Attmaca, Temel Uçar, Erol Poyraz, Alî Şahîn, Tahîr Seday, Ramazan Altınsöz, Husnu Ozen, Mehmet Aktan, Musa Çîçek İbrahim Özdemir û Nurettin Aslan.

Di nav salekê de bêtirî 350 kes bû qurbana "cînayetên meç'hûl".

Di 12 mehan de 12 rojnamevan hatin kuştin. Halit Gürgen, Cengiz Altun, İzzet Kezer, Hafiz Akdemir, Mecit Akgün, Çetin Ababay, Yahya Orhan, Hüseyin Deniz, Musa Anter, Yaşar Aktay, Hatip Kapçak û Namik Tarancı.

Di sala 1992'an de dewleta Tirk bi wêrankirina gundan nema, dest bi bombardûman û gulebarankirina bajaran jî kir. Êrîşa pêşî di Newrozê de dest pê kir. Şîrnex, Cizîrê dan ber topan, li Nisêbînê, Wanê, Geverê xelk gulebaran kirin. Şeva 18'ê Tebaxê Şîrnex û şeva 3 Çiriya Pêşin jî Pasûr 3 roj û şev kirin bin hesarê û dan ber bombe û guleyan. Dikan hatin şewitandin, erebe hatin îmhakirin, mal hatin talankirin. Di van êrîşan de bi dehan kes hatin kuştin.

## Kultur û rewşenbîri

Di sala 1992'an de gelekkovar û pirtûkên nuh li Tirkîyê derketin, qûşen zimanê Kurdi hatin vekirin, weqf û muesese û dezgehîn kulturî vebûn. Kovar û rojnamen derketine ev in: Rewşen, Newroz Ateşî (Agîrê Newrozê), Welat, Ahmedî Xanî, Serketin, Devrimci Yurtsever Gençlik (Xorten Welatparêzê Şoreşer), Tewlo, Azadî, Komel, Özgür Gündem (Rojeva Azad) û Nû-bahar. Jî vanâ Welat û Nûbahar xurî bi Kurdi ne. Medya Gunesi (Roja Medya) ji piştî demek dirêj, wek rojnameyek 15 roj dest bi weşanê kir.

Sala çûyî di warê muesesebûyinê de ji hin gavê dest-pêki hatin avêtin. Li Stenbole, Enstituya Kurd, Weqfa Çanda Kurdi û Weqfa Maf û Azadiyê Kurdistan hatin damezrandin. Qûşen hîndekariya Kurdi jî li gelek ciyan vebûn.

## Zelzela Erzîncanê

Roja 13'ê Adarê, li Erzîncanê zelzeleyeke mezin çêbû. 654 kes mirin, bi sedan kes birîndar bûn û bi hezaran kes bê xanî man.

Zivistana çûyî gelek giran bû, gelek berf ket û li gelek ciyî şepe ket 200 kes mirin.



# iebe"

alî aborî be, lehçeyen me li şûna ku nêzî hev bin, ji hev dûr dikevin. Mesela, ez heta 17 salı bûm min hiç Kurmancek nedibû. Kurmanc jî me 70 km dûr in, lê hatûçûnek tunebû. Lê piştî 1958'an ku Radyoya Bexdadê dest bi weşana Kurdî kir wê wextê Soranî-axêfan ji fersend û mescal dîtin ku bikaribin guhdarîya Kurmanci bîkin.

Di 1948'an de radyoya Hayfa û Erivanê ji bi Kurmanci program diweşandin û ji bo pêwendîyan hev nêzîbûna lehçeyan kêm ba jî feydeyek wê hebû. Lê muhîmtir ew e ku xelk bi xwe bikaribe li gel ye-kûdu qise bike û pêwendiyê deyne. Yanê Hewramiyek bikaribe biçe nav Kurmancan ji xwe re karêkî peyde bike, Kurmancek li mintiqâ Hewraman kar bike, yan ji li nav Soranan, ev yek dikare pêwendîyan de nav lehçeyan de çêke û wan nêzî hev bike. Ev ji bi dewletê ve girêdayîye. Lê Kurd nebûye xwedî dewlet, bi eksê wê bûne çend perçe û ji bo têkili û pêwendîyan hiç fersendek di destê wan de nîne. Ji ber wê jî pêwendîçenâbe. Ev ji ji bo yekîti an ji liehvîzbûna lehçeyen Kurdî asten-gek e, problemek e.

**S. Rêving:** Di wexta xwe de di nav zimanê Ewrûpî de ji prob-lemên weha hebûn, ma wan ji bi plan û programan problemen xwe çareser kîrin?

**Emîr Hesenpûr:** Di zimanê Ewrûpî de ev plana lenguistîkî nehaftîye kîrin. Çunkî wan bi awayekî tebîb bûye. Di dewra feodalizmê de Fransî, Îngilîzî, Almanî ji xwedî gelek lehçe bûn. Wê demê piranîya xelkê li ser zevíyen xwe kar dikirin, hat û çûnek di nav wan de tunebû. Li gundê xwe ji diya xwe dibûn, li gundê xwe dimirin. Lê piştî ku sermayedariyê dest pê kir, gund hêdî hêdî mezin bûn, bajar peyde bûn, sen'et peyde bû, burjûvazî peyde bû, produksiyon (berhem) peyde bûn. Bi vî awayî ew kesen ku hatin bajêr lehçe û devokê wan nêzî hev bûn, Lê di vê merh-eleyê de ew bajar, mintiqâ an ji emareta ku xwedî sermiyan bû, lehçeya wan ji bû serdest. Di warê nivîsin û kulturê de ji ew lehçeya ku desthilasiya wê hebû hukum kir. Yanê iro lehçeya Parîsê, ya Londonê ku bûne zimanê standart ê van welatan, li gor wan şertên ku me li jorê rîz kîrin di van me-rhele-yan re derbas bûn. Bêguman ev yek di sedsala 15-16'an de tenê li Ewrûpa Rojava weha bûye.

Li Kurdistanê merheleyek weha peyde nebûye. Ger peyde bûbe ji her dewletê dagirkir tesfîrek gelek mezin li ser rewşa Kurdistanê kirine. Di roja iroyîn de ji em nikarin vê yekî bikin, yanê teke-rura tarixê nabe. Ji ber wê yekî ye ku ez dibêjîm divê ku ji bo Kurdî em pilaneke zimanî çêkin.

**S. Rêving:** Baş e li gor rewşa

*îro ya zimanê me tu ji bo zimanê Kurdî pilaneke çawa difikî?*

**Emîr Hesenpûr:** Li Tirkîyê her gotine Kurdî nîne. Li Îranê ji her dibêjin Kurdî devokeke Farisî ye. Yanê resmîyetek zimanê Kurdî tuneye. Pêşî divê ku ji alî van dewletan ve Kurdî wek zimanî resmî bête qebûl kirin, ev gava yekem e. Gava duwem ji êdî nivîsina zimanê Kurdî ye. Ji gotinê Kurdî bigrin heta bi gramer û kitêbîn mekteban divê bêne nivî-

**Kurdistana Tirkîyê bigrin dest, du lehçeyen me yên sereke li vî perçeyî hene; Kurmanci û Dimili. Divê ku rojname û kovar bi herdu lehçeyan bin. Ger pêşde hin heq werin dayîn, divê ku mekteb, dersên mektebê, TV, radyo hem bi Dimili û hem ji bi Kurmanci hebin. Ev ji wê nêzîbûnekê têxe nabêna herdu lehçeyan.**

sîn. Ferhengê baş ên lehçe û de-vokan derkevin û her weha kitêb û kovar û rojnameyên cûre cûre ji ji xwe wê her hebin.

Ev her du gav pêwendîya wan bi hev re heye. Bi van herdu ga-van zimanê Kurdî dikare bigihîje nuxteyeke baş.

**S. Rêving:** Di mesela lehçeyan de planek çawa lazim e. Mesela iro li Kurdistanâ Iraqî azadî-yek heye û li wê derê du lehçeyen me yên sereke; Kurmanci û Soranî ji hene.

**Emîr Hesenpûr:** Li Kurdistanâ Iraqî Soranîxâfî ji Kurmanci-axêfan zêdetir in. Ji alî xwendin û nivîsinê ve ji ew ji yên Kurmanci-axêf pêşdetir in. Lê dîsa ji divê ku bi temamî azadiya herdu lehçeyan ji hebe. Yanê ji mekteb û TV'ye bigre heta bi rojname û kovaran, divê ku bi herdu lehçeyan ji hebin.

**S. Rêving:** Di mekteba sere-tayî (ilkokul) de divê ku zarok fêr herdu lehçeyan bibe?

**Emîr Hesenpûr:** Di mekteban de divê herkes bi lehçeya xwe bixwîne, lê lehçeyen din ji fêr bin.

**S. Rêving:** Li Kurdistanek mezin, çar lehçe, bi vî awayî ji bo dewletekê nabe mesref û zeh-metiyez mezin?

**Emîr Hesenpûr:** Na, nepêwîst e û lazim ji nîne ku her zarok çar lehçeyan fêr bibe. Mesela, Hewramî gelek kêm in, Kurmancek pêwîst nake Hewramî fêr be. Lê Hewramî divê ku azadiya wî hebe. Eger ew bixwazin divê mekteben wan ji hebin.

**S. Rêving:** Yanê tu dibêjî em pilaneke welê çêkin da ku zaraveyek an du zarava bi ser kevin, yên din hêdî hêdî bîhelîn û wenda bibin?

**Emîr Hesenpûr:** Ev li gor şer-ten Kurdistanê ye. Lê divê ku aza-di hebe. Yanê azadiya her lehçeyê hebe, çûn û hatinek, pêwendiyek dibe, xelk ji hev fêm dike. Weki

Kurdênu ku nuha li Ewrûpayê ne. Bi xêra têkili û pêwendîyan nuha em ji hev fêm dike. Bo nimûne nuha tu bi Kurmanci dipeyivî ez ji bi Soranî lê em ji hev fêm dike.

Dimili, Kurmanci, Soranî wê di dewletteke serbixwe de bêtir nêzîkî hev bin. Lehçeyen din an ji lehçeyek dibe ku di nav lehçeyek din de bihe-lin, ev ji alternatifek e. Lê divê ku ne bi zorê be. Yanê divê pêşî azadiya wê lehçeyê hebe.

**Z. Xamo:** Çar za-rava û gelek devokên me hene. Ji bo nê-zîkîbûna wan divê iro em ci bikin, ci pê-wîst e?

**Emîr Hesenpûr:** Di şertên iro-yin ên her parçeyekî Kurdistanê de divê ku program werin çekirin. Yanê mesela em Kurdistanâ Tirkîyê bigrin dest, du lehçeyen me yên sereke li vî perçeyî hene; Kuramanci û Dimili. Divê ku rojname û kovar bi herdu lehçeyan bin. Ger pêşde hin heq werin dayîn, divê ku mekteb, dersên mektebê, TV, radyo hem bi Dimili û hem ji bi Kurmanci hebin. Ev ji wê nêzîbûnekê têxe nabêna herdu lehçeyan.


**Z. Xamo:** Na, na, ne tenê Kurdistanâ Tirkîyê, ez ji bo hemû perçeyan dibêjîm.

**Emîr Hesenpûr:** Ji bo ziman em dikarin programek deyin, lê divê ku azadiyek hebe. Ger azadiya te tunebe, program ji li hewa dimîne, nakeve jiyanê. Ji ber wê ji divê ku organîzasyon û kovar û rojnameyên ku li Kurdistanê hene divê li gor şert û mercen xwe hin programan çêkin û bixebeitin.

**Malmisanij:** Ez ji dixwazim tiştekî bibêjîm, iro hin heval hene dibêjin gerek zimanekî stan-dart çêbe. Lê gava ku Kurmancek vê yekî bibêje qesta wî ya ji zimanî standart Kurmanci ye, ger Soranek be qesta wî Soranî ye. Li gor xwe sebeban ji tînîn, dibêjin Kurmanci piranî ne, an ji Soranî pêşketî ye û hwd.

**Di vê meselê de bi ya min ji divê ku her lehçe azad be.** Divê ku em ji wan bipirsin, yanê ew bi kîjan zaravayî bixwazin divê ku bi wiya bixwînîn. Yanê em ji Dimiliyekî re bi zorê nikarin bibêjin bi Kurmanci bixwîne. Plan ji ew e ku em alîkarîya hev bikin. Lehçeyen me nêzî hev bin, ji hev dûr nekevin.

**Mesela wextekê kak Ömer Sêxmus di Berbangê de nivîsibû ku gerek Kurmanc bi Soranî û Soran ji fêrî Kurmacî bibin. Lê Hewramî û Dimili divê fêr her du lehçeyan ji bibin. Yanê ci? Ev ne plan û programek e ku zaravayen me nêzî hev bin. Ev rast e rast aloziyek e, müşkileyek e ji bo zimanê Kurdî. Yanê çima ezê ra-bim hînî Soranî bibim lê Soranek wê hînî Dimili nebe?**



**Emîr Hesenpûr:** Na, ez ji wêlê nafikirim. Carê divê em bawerîya xwe bi vê yekî bînin ku her lehçe divê azad be, heqê her lehçeyê hebe ku mekteb û hwd hebe. İcar eger Dimiliyek dixwaze Kurmanci bixwîne an ji Kurmancek dixwaze bi Dimili bixwîne ew ji azadiya wî ye, êdî ew di-zane. Li welatekî ziman, aborî û siyaset divê ku bi hev re kar bikin. Yan na her müşkile derdikevin.

**S. Rêving:** Ez dixwazim pi-reseke din bikim, wekî tu dizanî iro Kurdistan bi sê elfabeyen cihê tê

**Bi ya min di alfaba Kurdi ya erebi de ji ali fonetiki ve qet problemek weha mezin tuneye. Têri zimanê Kurdî dike. Tenê kîmaniya herfîn Erebî ji ya Latînî bi min du-tist in ku ew ji : 1-Herfîn mezin û biçûk tuneye, 2- Di nivîsinê de herfîn Erebî bêtir cih digrin.**

nivîsin; Kîrîlî, Erebî û Latînî. Ev yeka ji bûye sebeb ku em ji nivîsin hev fam nakin, bêtir dûrî hev dibin. Ji bo vê tu ci difikiri?

**Emîr Hesenpûr:** Çare heye, lê plan û programen ku em çêkin wê çawa bi cih bîn. Yanê iro me-riv şertên Kurdistanâ Tirkîyê bide ber çavan, mirov nikare bi herfîn Erebî, an ji li Kurdistanâ Iraqî bi herfîn Latînî binivîse, yanê ev ji dîsa bi azadiyê ve girêdayî ye.

**S. Rêving:** İro li Îran û Iraq û Sûriyê alfabeten resmî yên dewlette Erebî ne. Kurdên van perçeyan Latînî bi riya îngilîzî, Fransî an ji Almanî fêr dibin. Lê li Kurdistanâ Sûriyê li gel wê ji her Kurdeki welatperwer Kurdî bi Latînî dixwîne û dînivîse. Çima li Sûriyê weha bûye, çima li Îran û Iraq û nikare bibe?

**Emîr Hesenpûr:** Tu behsa rewşenbirê Kurdistan Sûriyê dikî, neku xelkê normal, neku zarok. Yanê zarokekî mektebê an dikan-darekî Kurd texmîn nakim bikaribe bixwîne. Lê li Kurdistanâ Ira-qa ne weha ye. Her Kurd dikare rojname û kovarên xwe bi hêsanî bixwînîn. Lê divê em hewl bidin herdu alfabetan ji fêr bin, bi tay-bevê ronakbîr. Li kîjan perçeyî dibe bila bibe em piçekî xwe bişînin emê fêr bin.

**S. Rêving:** Tu bi xwe dibêjî bo min ferqa alfabet tuneye. Ci Erebî, ci Latînî. Herdu ji fonetik in. Li gor zimanê Kurdî ne. Lê elfabe divê ku ji bo zarakan wele hêsan be, hem xwendinê, hem nivîsandinê hem têgehiştinê hê-san bike. Dema em alfaba Kurdî ya Latînî û Erebî didin ber hev,

# Çirok

Ji kelegermê her der diqijili. Elifê bi huçika xwe xwidana eniya xwe paqîj kir. Awirên wê yên bi tirs û pîrî kerb cûn ser tutina li ser melesê. Paşê çavên xwe li odê gerandin. Di dilê xwe de got: Min çiqas xweş raxis-tiye, her tişt li cihê xwe ye.

Ger awirêن wê neçûbana ser tutina li ber, wê kêfa wê ji wê re bîhata. Lê nebû; dilê wê lerizî disa, pêlên tirsê xwe bi ser laşê wê de berdan.

Ji nişka ve rabû ser xwe, çitîka xwe li serê xwe girê da, melesa tijî tutin ji çar qorziya gihad hev û berê xwe da malka cîran.

Çaxa ket hewşê bîn lê çikiyabû. Eyşê şaş ma:

- Xêr e keçê, ci ye ev halê te?

Elifê tiştek negot, melesa di destê xwe de nişa dayê.

Eyşê bêtir bi mereq:

- Ci ye tê de, ka bêje!

- Tutin e...Kambaxê, nikarim...

- Weyla rebenê, tu hatî vî 'emri û nizanî cigara bipêcî?

- Babê min nedikişand Xwe-hê. Çavê diya min jî birjin, her tişt nişa min da, lê tutin...

- De bêje ha. Nexwe diya te daye cahşîkê û ker ji bîr kiriye.

Bila guhar be, di guhê te ve be, bi şev berê mîrê xwe, bi roj ji qûtiya tutina wî vala nehêlî!

Dêmê Elifê ji fediya sor bû. Bi şermokiya panzde saliyan serê xwe bera ber xwe da. Eyşê bi ken pîrsî:

- Bûye heftiyek?

- Heftiya ci?

- Ku tu zewicî keçê.

- Erê.. Do ket heftiya duduyan.

- Xwedê ruhê te bistîne, baş e.

- Çîma xweha Eyşê?

- Heftiyek xilas bûye û nû aqilê te hatiye serê te. Qey heta nuha te mîrkê xwe bêtutin dişand?

Elifê bê hedar bersiv da:

- Na, na. Cigara pakéta dikişand. Lê do tutina qaçax bi dest ketiye, xwezî te bidîta, bi ci kêtê hat malê.

- De were, were, were nişa te bidim çawa tê pêçan, li derive em peritîn.

Cûn odê.

Eyşê dest avêt destikeke pe-like. Bir ber lîvîn xwe û pîf kirê, pel ji hev vebûn. Yek ji nav kişand, paşê tiliya beranekê û ya şehadetê bi teniştîki gihadin hev, pelik danî ser, bi destê din rahişt piçek tutin û li ser pelik raxist. Di vê navê re serê xwe raxir, li Elifê nêrî. Elifê bi her du çavên belbûyî lê mîze dikir:

- E ji welê çedîkim.

Eyşê serê xwe hejand:

- Huner ew e ku tutina te bi hesab be, ne kêm, ne zêde.

- Ma pîvanek jê re tuneye?

- Wext divê keça min. Bi pêçanê. Heta tilî ji, çav jî baş lê biste bin.

Eyşê gotina xwe li vir birî. Pel tutin li ser, bi hostatî di nav tiliyênen xwe de pêş û paş çend cara zivirand, paşê perik bir nav lîvîn xwe, aliyê vekirî bi serê zimanê xwe şil kir û bi aliyê pêçayî ve danî. Elifê bi lez destê xwe

# TILİYÊN SPEHÎ

Bekir YILDIZ

\*

Wergêr: S. Rêving

dirêj kir û got:

- Ka bide min xweha Eyşê, ya mayî ez ê çêkim.

Eyşê neda, pişti ku pelê aliye ku tê vêxistin bi ser tutinê de baş girt, piçekî bi hêrs lê vege-rand:

- Huner ew e ku tu cigarê bipêcî. Pîra min jî dikare pelê serkê wê bigre. De hedê ha, çêke!

Elifê dest pê kir. Tiliyênen wê dilerizîn. Kir û nekir, nekarî pelikê tutin li ser di nav tiliyênen xwe de bibe û bîne.

Eyşê li destê Elifê xist û got:

- Erê keçê, berî nuha te nepêçaye, ma te qet seyra ke-sen cigare pêçayî jî nekiriye bêaqîlê!

Elifê nexwest Eyşê aciz bibe:

- Ez qurbana te bim Eyşê, aciz nebe. Ez biçûka do me. Careka din nişa min bide.

- Va ye bû évar keça min, ezê xwarinê deynim ser kuçkê.

- Tu bi Xwedê kî, bila êvarî rûyê xwe li min tîr neke.

Destpêka zewaca Eyşê hat bîra wê. Mîrê wê çawa goti-neke wê nedikir dudu, li dor wê dicû û hat... Li hember lavelava Elifê dilê nermijî:

- Bila tu işev rûreş nebî, ka bîne bi lez ji te re qûtîkê bipêcîm. Tu ji baş li tiliyênen min binêre ha. Sibe ji te re napêcîm.

Roj ji zû de çübû ava, tarî ketibû erdê. Lê te digot qey tavê xwe di nav taristanê de veşart-ye; her der dikeliya.

Eyşê kuleya li ser textê li hewşê hêdi hêdi bi dilê xwe ve-girt. Aliyek jê vekirî hişt, paşê gazi mîrê xwe kir:

- Hazir e.

Mîrik bêyî ku tiştekî bibêje, cû nav cihan û xwe dirêj kir.

Bistikeke dirêj nepeyivîn. Çi nemabû mîrik xilmaş bibe. Lê çavên Eyşê ziq vekiribûn. Ke-virekî giran xwe dadabû ser dilê wê, geh vî alî, geh wî alî, li ser dil dixîşkî. Ji nişka ve cigarên ku ji Elifê re pêçabûn hatin bîrê. Yekser sedema giraniya li ser dil nas kir. Bedena xwe ber bi ya mîrê xwe ve xişkand:

- Ero, tu raketî?

Dengê mîrik te digo qey ji bin text tê:

- Erê xilmaş bûme.

Eyşê nexwest mîrê xwe şîyar ke. Ma, ma. Awirênen xwe ber bi jor bilind kirin. Te digot esmanî xwe li ser kuleye raxistibû. Stîrk li jêr; heçko hatibûn şûş-tin, welê paqîj bûn.

Eyşê çavênen xwe girtin. Lê xewa wê nedihat. Têgîhişt, ger bêmerfetiya Elifê ji mîrê xwe re nebêje, wê xew nakeve çavênen wê. Ji nû ve gazi mîrê xwe kir:

- Ma xewa te tê, mi go ez tişkî

bêjim.

Mîrik ji cihê xwe pengizî, aciz bûbû:

- De bêje dê!

Eyşê peyv bi lez bi hevdû ve girêdan:

- Ma jînên nuha jî jin in. Berê her tişt çetin bû. Nuha her tişt hêsan bûye. Elifê tu nas dikî. Elifâ ku ku berî heftiyekê dawetâ wê çêbû?

Xewa mîrik piçekê verevi.

- Éêê, ci lê hatiye? Nekeç derketiye?

- Na, na.

- Lê ci ye keçê?

- Ez bêjim tu wê jî kena bimrî.

- Keçê de bêje, ezê li devê te xim ha!

- Elif nizane cigara bipêce.

- Weee...!?

- Erê wee dê. Jin jî hene, jîn-kok jî hene. Di dema me de kê li rûyê jînên weha dinêrt. İca rabûne du dar gihadine hev, dibêjin ha jîn e û difiroşin.

- Mîrê wê nuha baş lêxistiye.

- Ka bisikine, binêre iro ci bû.

Rûyê Eyşê seranser dikeniya.

Bedena xwe piçek din nêzî ya mîrê xwe kir. Dixwest huner û merifeta xwe û nezanîna keçênuha, bibêje û xweşîya gotinê heta dilopa dawî jî têkeve nav laşê wê.

- Erê dê, weha ye dê. Hîn ji heqê cigarê nayê der. Ma ew jî jin e. Hîh. Ci ye 'bavê min cigare

nedikişand, diya min jî hînî min nekiriye'.

Mîrikî kurt birî:

- Binasê diya wê ye. Diviyabû li serê wê xistiba û nîşa bidayê. Ma ne bi derewa dibêjin ku roja Qiymetê nêzik bûye.

- Erê bi Xwedê rast e. Bi wuc-dan bêje ha, min qet tu bê ci-gare hiştîye? İca tu qedrê min jî nizanî.

- De xwe nepesinîne tu jî

- Çîma nepesinînim. Dîsa min mesele hel kir.

- Çawa yanê?

- Xêra babê xwe, min jêre qûtî pir kir.

Mîrikî bi xezeb berê xwe da jîna xwe:

- Qûtîya kê?

Ji nişka ve tiştek wek siya şevrevînkê li pêş çavênen Eyşê xuya bû. Şaş ma. Tîrsiya. Di nav lîvîn çîlmisi de peyv bûbûn benîşt:

- Qûtîya ku Elifê bi xwe re anîbû.

Mîrikî porê Eyşê li destê xwe aland. Laşê wê tev dilerizî.

- Ye'nî di qûtîyen peyayine din de cigarên te hene, e qehbê.

- Ma ci xirabî tê heye? Qurbâna te bim li min nexe. Bide xatirê nezaniya min. Ayy, yadê!

Mîrikî hem lêdixist, hem diqîriya:

- Hey qehbîka cil salan, xirabî tê tune... tune e... tune e. Dêli-

ka bêaqil. Te ez rezîl kirim, riswa kirim.

- Tobe be, tobe, ez qurbana te bim, min gû xwar, li min nexe. Gunehê min bêje.

- Gunehê te? Ha, va ye ha...ha...ha. Ma nizanî wê sibe ci bîbel? Ew teres wê sibe here çayxanê... Qehba kolanan... Te ez kuştım... Wê here çayxanê, wê qûtiya xwe derxe, cigara pêşkêsi dost û hevalén xwe bike.

Ew bênamûs jî wê bigrin, bikişinin. Tutina xweş e. Yeke din, yeke din. Wê li cigarê binêrin, bibêjin çiqas xweşik hatiye pêçan. Ya mîrkê wê hingê bi-bêje...

- Hestiyênen min hûr-hûrî bûn dayê...bes e...li min nexe, ez ketime dexlê namûsa te, bes e.

- Lê nexe e. Keçê divê ez te bidim ber gulleyan. Ka, ka çifta min li kû ye? Orispî. Ya mîrê wê hingê bêje. Ya bêje jîna Osmanî Zêringir pêçane...

- Ez mirim lawo, ez miriim.

Destê mîrik hîn jî bi hêrs ra-dibû û dadiket.

- Ez mirim nel... Tu mirî, yan ez. Eyşika çavlider... Jîna Osmanî Zêringir pêçane nel!..

Wê hingê ci bibe? Wê ew qe-wad çavênen xwe negrin û tiliyênen te neyînin xiyalâ xwe? Emê çawa rî li vê bigrin ha qehba keça qehba... Wê nebêjin ci tiliyênen spehî ne ev. Ü wê nefikirin ku pişti cil saliya xwe jîna Osmanî Zêringir çîma cigara ji peyay-ên bi jîn re dipêce?

Bîn li Eyşê çikîya, çikîya, ji hisê xwe çû. Her di vê demê de li malka cîran Elifê ji mîrê xwe re digot "Min iro ev cigare ji te re pêçan".

Her du beden gihiştin hev.

## Rono û sirûdên bêrikirinê

# NOSTALJÎ


Ehmed Huseynî

Yara min... Babeliskeke xwingerm û sergerdan ji rewrewka wê çolistanê dipijiqe. li ber dergehêne riziyayî yên dilê min, toza xwe pêşkêsi termê bêrikirinê dike... Şeveke reş a tarî giyanê min bi bîna hinê, bi tîna gulbeybûn û bezhezûkan, mîz dide. Ez û pencereya çavbirçî, gulên ku ji çîlmîsandînê çeng dîbin û baskên mirinê, ta ku di hîlinâ payina min de fîri fîrinê bîbin.

Erê yarê... va me, di perest-geha şîniya dijwar de me, di nav destîn xwedâki zorba de, wek mirîdeki gunehkar dilerizim. Li beramber çîren qonaxê bi destê westana xwe digrim û bi hustexwîl sucde dibim. Firtonan û şevbuhêrkenê bi tore di bibikên xwe de kedi dikim, bê berpal û bê fener, di zîxtên mirina hovane de, aferîdeyekî bê zar û xewnşikestî me.

Ez dê ji kîjan ali ve xwe bi ser çemê naflîna we de noq kim?

# Li herêma Serhedê tedbîrên tendurustî têr nakin



Prof. Erol Oral: "Dê û bav ji ber ku nikarin zarakan baş xwedî bikin, nexweşiyê zarakan li herêmê gelek in". Foto: H. Kardoxi

Rektörê Unîversîta Erzûrmê Prof. Dr. Erol Oral li ser tendurustiya herêma Serhedê - dewlet vê herêmê bi navê Rojhilat Andolê bi nav dike- beyanak da.

Prof. Erol Oral got xizme-

tên tenduristî yê li herêmê, têr nakin. Rojhilat -mebest Kurdistân e- feqîra tundurustiyê ye. Dervayî kesen bi sigorta û di kar û barêne dewletê de dixebeitin, xelk ji ber feqîriyê, te-dawiya pêwist nabîne.

## Bersîvek mecbûrî

**Destpêk r. 4**  
dibêje te li ser "Bûyera 49'an" nivisiye. Tu wan gişan nas nakî û tu bi wan re nemayı, wê gavê tu çawa dikanî li ser wan binivîsin?

Rohniya çavê min, ma di nivîsa xwe de min gotiye, "tu Mestûre Xanimê nas nakî, te pê re hevalî nekiriye, tu çawa dikanî li ser binivîsin?" Min gotiye te nivisa xelkê girtiye û te ev yek ji bi tu hawî destnîşan nekiriye. Ma di her hejmara Azadiye de nivîsên li ser tarixê tune ne, çima min ew rexne nekiriye? İcar heger min ji di nivîsa xwe ya li ser "Bûyera 49'an" de yek rêt, ji ji derekê girtiye, kerem ke bibêje. Tişte min girtiye min çavkanî nîşan daye. Mesele hewqas zelal e.

Rexneya X. Lezgîn ya din ji dibêje te demekê di quncikê bi navê "Hindik Rindik" de pêkenîn -fiqre- dînîvîsin. Ev nav berê di Hawarê de hebûye, lema ev ji dizî ye (baş e ku X. Lezgîn negotiye min navê xwe ji diciye) û ya din, divê min li bin her pêkenînek navê xwediyê wê ji binivîsanda.

Wer xuya ye X. Lezgîn bîderekî pir henekî ye. Ji bo ku di ziya xwe meşrû nîşan bide xwe dixe reweke pir ne xweş. Birayê eziz, munaqeşa me ne li ser nav e. Tiştekî pir xeyrî ciddî ye ku meriv diciya nivîsa xelkê û wekheviya navê do quncikan têxe çaviya mîzînekê. Ma min navê Azadîye rexne kiriye? Ji bo iddiayek wiha divê meriv pir nezan be.

Em werin ser "diziya" (!) pêkenînan. Ez bawer dikim ev iddiâne hewceyî bersîvî ye. Çimkî herkes dizane ku xwedîyê gotinê pêşîyan û pêkenîn nayê zanîn, ew malê gel in. Meriv bixwaze ji meriv nikane xwediyê wan bibîne. Li gel vê ji, di quncikê xwe de min gotiye yê "amadekar". Bi vî hawayî ji min diyar ki-

Prof. Erol Oral cihalet ji wek sedemeke din nîşan da û got "Mirovê herêmê ji ber ku baş perwerde nebûne û nexwenda ne nexweşinan muhim nagirin. Dê û bav ji ber ku nikarin zarakan baş xwedî bikin, nexweşiyê zarakan li herêmê gelek in".

Dû re, Prof. Erol Oral bi raqaman rewşa tendurustî ya herêmê raxist ber çavan; "Li herêmê 3 xusûsi, 83 nexweşxane hene û di wan de 5685 textê razanê hene... Di tevayıya Turkiyê de ji serê 416 kesan textek razanê dikeve, li herêmê ji serê 885 kesan yek dikeve. Herwisa di tevayıya Turkiyê de ji her doktorekî re 1270 kes dikevin, li herêmê serê her doktorî 3750 kes dikevin. Bi tevayı li herêmê 1786 doktorên pratisyen, 547 doktorên pispor, 240 doktorên diranan, 2432 hemşire, 1175 memurên tenduristî û 2550 ebe xizmeta tendurustî didin. Lê pêwist e ev reqem ji sedi 200 zêde bibin.

gerandiye tîpên Latînî û bi pêşgotinekê di Roja Nû de weşandiye. C. Rênas di pêşgotinê de wiha gotiye:

"Li Iraqê kêm be ji, ji aliye lêkolîn û pêşyeçûna ziman û edebiyata Kurdan xebat hatiye kîrin (...)"

Ji van lêkolînan yek jê ji, ji aliye Heme Salih Ferhad va hatiye kîrin. Di sala 1988'an de bi navê "Çend Layenekî Rojnamûsî Kurdi" (...)

Min ev lêkolîn ji tîpên Erebi wergerand û adepteyî Kurmanciya jorê kir" (Roja Nû, no. 29, r: 4)

Lê ev lêkolîna H. Salih Ferhad pişti ku çûye Tirkîye û tercümeyî Tirkî bûye (binêre Deng no:22, r. 52-62), navê H. Salih Ferhad ji ser semitiye, xwediyê wê icar bûye C. Rênas.

H. Kiliç ji di pêşgotina rojnama Stêrê de listeyeke berhemên Kamiran Bedir-Xan dide. Fena ku di vî warî de wî bi xwe lêkolînek fireh kîrî. Lê rastî ne wiha ye. Wî ew lista berhemên Kamiran Bedir-Xan raste rast ji pêşgotina Roja Nû (Roja Nû, r. 8) girtiye. Ü ev yek ji negotiye. Bes tiştekî wî hêjâyî teqdîre ye, rêza liste ji têde, liste qet neguherandiye. Erê kopye kîrî, lê bi eslê kopye re sadîq maye. Di pêşgotina Roja Nû de çawa hatibe nivîsin wî ji wîsa girtiye. Di pêşgotina Roja Nû di rêza 4"em de di dêli "Le Kurde Sans Paine" de "Le Kurde Saus Paine" hatiye nivîsin, wî ji ew çewtî kîrî, "saus" (rastiya wê "sans" e, bi Fransî tê maneya "bê") nivîsi ye. Dîsa di pêşgotina Roja Nû de navê berhemekê bi çewtî du caran (rêza 5 û 15) hatiye nivîsin, wî ji her ev çewtî kîrî ü qet "hewce" ji nedîtiye ku çavkanîye nîşan bide. Nuha gava ez viya bibêjim, ma ez dibim "çavnebar, zikrê û hesûd"? Ma dizî ne eyb e, İlankirina diziyê eyb e?

Mesela di van demen dawîn de bi tesadufî ez rastî du biraderen din ji hatim, ku wan ji nivîsên xelkê bi **dizîka** kirine malen xwe. Navê yekî Casim Rênas e û di Roja Nû û Dengê de nivîsiye, navê yê din ji Hazim Kiliç e.

Di hejmaren Roja Nû yên 29 û 30'ı de li ser rojnamegeriya Kurdi li Iraqê nivîsek derket. Nivîs ya Heme Salih Ferhad e. Casim Rênas ew ji tîpên Erebi wer-




## Weşanên Nuh



**Mûrad Ciwan; Türkçe Açıklamalı Kurtçe Dilbilgisi-Kurmancı Lehçesi** (Gramma Kurdi Bi Izaha Tirkî-Lehça Kurmancı); Weşanên Jîna Nû, Uppsala, 1992, 224 rûpel.

Kitêb bi Tirkî li ser gramera Kurdi (lehçeya Kurmancı) ye. Nişkar di pêşgotina xwe de bi tefferruat li ser zimanê Kurdi, lehçe û devokên wî sekinîye. Piştre gramera Kurmancı li gor planekekê û li gor rîzê tehlîl kirîye. Di her mewzûyeke gramerê de pêşî behsa tişten heyî dike, paşê li gor xwe alternatifî fine. Herweha di gramera Kurmancı de behsa hin nuxteyên nû ji dike. Mesela di qismê fîilan (kar) de gava ku behs dike dibêje hemû fîilen Kurdi xwedî du kok (reh) in. Yanê "Gotin" di halekî de dibe "got", di halekî din de ji dibe "bêj", mesela hin mîsal: Xwarin, xwar/xw, Kirin, kir/k, Çûyin, çû/ç û hwd. Dîsa di beşê zamîran de bi dûr û dirêj li ser zamîren şexsî sekinîye. Mesele di halekî de "çawa ku di Kurdi de nav tê tewandin, her weha zamîren şexsî ji tê tewandin. Yanê "min" halê tewandî yê "ez" "ye".

Wek çavkanî ji bi taybetî ji çavkanîyên Kurmancı û Soranî feyde girtiye. Kitêb bi awayekî akademik hatîye amade kîrin, ji kesen ku Kurdi nizane bêtir, xîtabî kesen ku Kurdi zane dike.



**Malmisanij; Abdurrahman Bedirhan ve İlk Kürt Gazetesi Kurdistan Sayı: 17 ve 18** (Ebdurrehman Bedirhan û Yekem Rojnama Kurdi Kurdistan Hejmar 17 û 18) Stockholm, 1992, 138 rûpel.


Wekî tê zanîn yekem rojnama kurdi Kurdistan cara pêşin di 1898'an de li Qahîreyê derket. Xwedî û berpirsiyârê wê yê pêşin Mîqdat Midhet Bedirhan bû, pişti hejmara şesan birayê wî Ebdurrehman Bedirhan bû xwedî û berpirsiyârê wê rojnamê. Heta nuha bi qasî ku hatiye tesbîkirin 31 hejmaran wê derketine. Di 1972'an Kemal Fûad ew hejmar hemû bi hev re ji nû ve çapkirin, di 1991'an de ji M. Emin Bozarslan li gel wergera wan a bi herfîn Latînî ji nû ve çap kirin. Lê di van her du çapan de ji hejmaran 10., 12., 17., 18., û 19. tunene.

Malmisanij ji wan pênc hejmara du hejmar (17. û 18.) peyde kirine û li ser hejmaran 17. û 18. (1899) disekine. Ligel orjînalên wan, her weha wî ew wergerandine herfîn Latînî ji. Bi vê wesileyê behsa jiyan û xebata Ebdurrehman Bedirhan, Ebdurrezaq Bedirhan û M. Salih Bedirhan ji dike. Mesela mewzûyeke gelek balkêş ku heta nuha nedihat zanîn di vê lêkolînê de heye ku ew ji masonbûna M. Salih Bedirhan e. M. Salih Bedirhan di 1900'ı de bi navê **Ummîd** rojnameyeke masonîk derdixe. Di kitêbê de Malmisanij bi dûr û dirêji cih daye wê rojnameyê ji. Kitêb ji bo kesen ku li ser tarixa Kurdan a sedsala 19'an dixebeitin çavkanîyeke hêja ye.



**Mahmûd Lewendi: Mala Xwedê (pêkenîn), Weşanên Hêlin, Stockholm, 1992, illustrasyon: Mamoste, 118 rûpel.**

Kitêba pêkenînan e. Tê de nêzî 130 pêkenînen cihê cihê hene. Hinek ji wan raste rast ji Kurdi hatine girtin. Hinek ji ji zimanê cihê hatine tercume kîrin, an ji adabteyî Kurdi bûne. Amanca ji vê berhevokê ew e ku xelk bêtir ji xwendin û nivîsina Kurdi hez bikin. Ci bigre di her rûpelî de karikaturek ji hatiye çekirin. Karikaturên wê ji alî Mamoste ve hatine çekirin.



**S. S. Evîndar: Yezidilerin Kaderî mi? (Qedera Yezidiyan e?), Almanya, 1992, 52 rûpel.**

Kitêb wek broşürekê hatiye çapkirin. Ji lêkolînê bêtir wek meqaleyeye dirêj a nîv-siyasi ye. Bi kurfi li ser rewşa Yezidiyan disekine ku hin dewlet û hêz û heta şêxen Yezidiyan çawa dixwazin Yezidiyan bi kar bînin û wan ji mesela milli ya Kurdi bi dûr bixin.

amadekar:  
**M. Pakdemir**

# Mİ ŞÊX SE'ÎD DÎ -II-

## MALMÎSANIJ

### ŞÊX SE'ÎDÎ RA PEY SE BI?

Ma û eskerê Tirkan ma yewnan zav çarna. Ez vana qey Pîran û devanê Pîranî di se - di sey heb şarê ma ra kişiyyat. Eskerê Tirkan ra zî se - di sey heb kişiyyat.

Rojê, Roy Vêrdanî ver di ma û eskerî ma zav piya nay, jînî ra zav merdi, aw di şî. È Hêni ra hameynî ki bêri no ver, ma zî waşt-nî ki nêverdi è bêri no ver.

Herçî ma texsîr nêkerd fejet be'dihesab zav esker hame, hukmatî zor kerd. Înî cay heme pîr esker bî. Çew Pîran di nêmendbi, şar heme remabi.

Eskeran çadîri day piro. Aşma marti (adari) bî. Vart û varan bi, serd bi, mîrdim teber a xeniçeynî. Ma şarê inî dewan pîro koyan kewti. Ci kes keye di nêmend. Ma mal û halê xwi ca di verda.

Ma ki remaynî, ge-ge şarî vatînî "Esker ha yeno!", cenîyan qatixê xwi, çîy xwino giran ver 'ard daynî, bila kerdi. Qelbinijan ci xwi devistinî dolekan zerre.

Ez şiya Koy 'Erseki. Ma heybanê (heywanê) xwi tanî xwi reydi berdi. Wexto ki ma Koy 'Erseki di bî, Xal Mihikê Yemoy zî ma reydi bi. Xal Mihik exter bi. Mi vir yeno yew ray veyn da, va:

"Eylekinî! Dîyerbekir teslim bîya. Kemal Paşa (30) têna mendî, hîrê-çer hebi zî zefî mendî, bêri ma sérî!"

Ma 'enê hamey, ma ewney ki hukmatî inî ortey giroti, çadîri day piro. Tanî çadîri Tewrin (31) di daybî piro, tanî Keyanê Koçan (32) di daybî piro. Înî dor-marî pîr esker bî. Ma ay hîrê-çer aşmî teber a bî, ma inî cayan ra perîşanî bî. Hukmat hinî zirra, nêvindert, çimka zorê ma berdbi. Hinî pîze yewî nêveşnaynî. Ma ay vart û varan di, ay serd û puk di timo koyan ra bî. Zav ray ma veysanî bî.

Eskerî ne qazik verdaynî, ne dori verdaynî, ne nivîni verdaynî. Ci keyanê ma di nêverdabi. Hewt hebî dorê ma bî, ma helawi dekerdinî, eskerî şikitibî. Çiyo ki zerrey keyî di bi, eskerî hewa nabi, berdbi. Dewar û bizê ma gitroşbî berdbî. Ma zî yaban ra belingazî bî. İnsan ina 'elem bi. Vera vera hukmat sist bi. Be'dî yew zeman hame, va "Efî hamewo, bêri bindê banandê xwi." Ma hamey keye ki ci bêri! Eki ci keye di çino.

Eskerê Tirkan be'dî zî şar kiş. Mesela Qelbîn ra Huseyn bi, ma ti ra vatînî Huseyno Çurro, eskerî o kiş. Elî Hediki kiş. Dêrey ra Bekirê İmişi (Bekirê Huseynê İboy) pêrodayışê Pirdî di kişiyyabi.

Cindi hebî mehkumî bî, è zî kişiyyat. Mesela Ehmedê Huseyn Axay (33) pey Kufarbi (34) di yew mexera di bi; eskerî şew vist ser, serey jey dera (dira) kerd, vist tewrey estori, ard qumandarî rî.

### DELU FIKRÎ

Şêx Se'îdînî ki xeniqnat, herbî qediya û tanî zeman beyntar di şî, hukmatî mîrdimê xwi erşawîti, va "Biçarnî veynî inî gurey kamî kerdî."

Qumandaran ra Receb Begî çadîra xwi Pîran di day piro, Delu Fikrî (35) zî hame çadîra xwina sîpi raştey Dêrey di day piro.

Eskerî rojê şiybî Qelbîn, camêrdê Qelbînijî heme dekerdibî camî Qelbînî; ta geyraybî, tira da-vîst heb camêrdê şekî û hêşkewtey vîjnaybî. Pey qemtanê kulawanê jînî polê jînî pî ya bestibî. De kulawê ma ay wext zav xişnî bî. Ey mi bi xwi zî zav xişnî bî.

Ma Dêrey di bî, ma dî ay Qelbînijî ardi Dêrey, qumandarî het. Dewanê bînan ra zî, Dilbi(36) ra, Herêdan(37) ra tanî tebîşûbi.

Nimajî şefeqi alayya eskerî Dêrey ra wena şî, inî camêrdê ki tebîşûbi zî xwi reydi berdi. Rojo bîn ma pey hesej (hesiyay) ki berdi dokinarê Pîranî di, Xizikî (38) heti kişî. Tira tena çend tenî xelisiyay.

Çend Qelbînijî ki inî qiflî reydi berdibî, inî bî: Ehmedê 'Evdî, Mehemedê Misfay Remzanî, Ehmedi Zeyni, Mehmedê Mehmedî, Misfay Mihoy. Husê Werda Efî, Husê Meyri û 'Emerê Mihikî zî inî qiflî reydi bî. 'Emerê Mihikî, binê leşanê jînî di mendbi, birîndar xelisiyabi.

Mehemedê Misfay Remzanî yo ki weyra ra xelisiyabi, be'dî vatînî "Eskeran polê ma pî ya bestî, gew dekewtî ma miyan, qesetura reydi day ma ro. Ey mi yew 'eba mi ra bî, qesetura ki day 'eba ro, qesetura 'eba qul kerdi labrê gudvey mi nîresay, mi xwi çeng kerd ewra vist 'ard."

Mehemedê Misfay Remzanî a-yawa xwi merg na bi, xelisiyabi.

Qelbînijan ra Ehmedê 'Evdî, Mehemedê Misfay Remzanî, Ehmedi Zeyni, Mehmedê Mehmedî û Misfay Mihoy a şewi xelisiyay. Sungî goşê Misfay Mihoy ro gi-naybî, goşê jey derra kerdi labrê nêmerdbi. Ayê ki xurtî bî, qewtelî bî, qemîtê xwi qerfnaybî, vazdaybî. Ay bînî weyra kişibî.

Rojo bîn ma pey hesej, cenî şî weyra, meyîte jînî dîy ki eskerî tahtî ser nay, çomir û herri ser darîtibî. Weyra cenîyan meyîte inî mîrdiman dibî, zor şirasnaybî (şinasnaybî).

Kîstan ra mesela inî wîrdî Qelbînijî bî: Mehmedê Bawkal Şêx 'Elî (verî key Bawkal Şêx 'Elî Qelbîn di bi, be'dî key xwi ard Dêrey) û Mehemedê Mehmedî Eli.

Waya Mehemedê Misfay Remzanî, Elikî zî semedê biray xwi ra qifley cenîyanê Qelbînijan reydi şibî inî kiştan ser. Şibî ki sax ko veynî biray ja weyra wo yan weyra niyo. Elikî vatînî "Çantey Mehemedê Eli hima beyntarê salan û timanân jey di mîradaye bi. Di letey nano wiş te de bi."

Bêxejya inîyan Mehmedê Wi-soy o Basrafîj zî kişiyya.

Delu Fikrî mîralay yanî alay qumandarî bi. Hewawo ki ez pey hesiyaya, hukmatî o û yew alaya eskerî Bozantya (39) ra ray kerdi. Zav zulum kerdi, insan kişiyyî. Yew bînbaşî jey reydi bi. Yew Erebê siyay mendînî.

Hukmatî Delu Fikrî ray kerdi, vatbi "Şo veynî ina ci da'ba ya" Û

emir dabî bere (bide) vatbi "Bikişî!"

'Elî Xal Huseynî zî mesila Şêx Se'îdî di remabi hamebi keye. Dîna ki sakin bîbî gilana şibi cay xwi (alayya xwi). Mi nêzanaynî ki şîyo. Yew estorsêparey di ez keye ra vejiyaya şiya key 'Elî Xal Huseynî, mi cenîya jey ra va:

-'Eysê, 'Elî Efendi keye d' o?

Va: -Ney.

Mi va: -La kura wo?

Va: -Gama bîni estora xwi wenîş şî. Rewna ewta bi, izinlî bi. Eyro gilana şî alayya xwi.

Ez tepe ayejraya. Ez hameya berê Wisê Zerîfi ver ki ay kuçe di yew mufreze, da-des eskerî ha yenî.

Mevaji ki hamey Bazbindi (40) di cind tenî kişî, dokinarê Bazbindi di Akragi (41) di new tenî kişî. Mi ra va:

-Bê ewta.

Ez şiya, va: -Veynda muxtarî û azan di.

Muxtar hame, eskerî va: -Ma rî belxul, nan û ardî lazîm î, şima ganî pêser kî!

Keyan ra zorî reydi hîri barî çî pêser kerd.

Ma hamey binê Tuyera Seffî (42), yew eskerî mi ra Tirkî va:

-Tawux yoxtir, tawux? (Kergî çîna, kergî?)

Mi weş Tirkî nêzanaynî. Mi va: -Yoxtir. (Çîna.)

Jînî ra yew eskerî va: -War, war. (Estî, estî.)

Mevaji ki gama ki hamey, ewra kişâ dewi di key 'Elî Xal Mihikî di kergî qixaya.

Mi va: -Nîrde war? (Kure esta?)

Va: -İste şu ewde war. (Hanî ya aw keye di esta.)

Va: -Haydi.

Ma şî, berê 'Elî Mihikî ver. Xejika 'Elî Xal Hemoy, cenîya 'Elî Mihikî weyra bî.

Mi va: -Xejê!

Ay va: -Ha.

Mi va: -Inî kergî wazeni, ti vaji "çîna".

Ti mevaji ki eskeran ra yew he-way ma (Kirdki) zano, va:

-Sen benim anamî awradimî s...! Senîn bir se'etin qalmış. Senî oldiracaxam. Ben quesabem quesab! İtoxlî it! Xayîn, sen nîye qarîfa diyor "Soyle tawux yoxtir?" (43)

Ma şî Qumandarî heti. Qumandarî va: -Dewijan hemînî bancî pêser!

Eskeran camêrdê dewi antî pê-ser. Zerrey dew di katezurr nêverda. Hewtay û şes tenî arê kerdi ardî, ma pî ya bestî. Verî polê ma bestî, be'dî akerdi va "roşî". Şîy yew cema çiwanê ternan ardi, va

"Ma tifing şima ra nênanî, ma şima kuwenî, ma inî çiwan şima ro sîknenî, pey kütis şima kîşenî. Tifinganê xwi, silehê xwi berî teslim kî."

Mihê Huseynê Avlay muxtar bi, va:

-Sîlih çîno, ma sîlihê xwi dawo.

Va: -Şima dawo kamî?

Mihî va: -Ma dawo Receb Begî.

Râsta zî Dêreyijan çewres heb tifing dabi Receb Begî. Receb Beg zî alay qumandarî bi, Pîran di bi. Yew alayî Dêrey di bî yew alayî zî Pîran di bi.

Mist vano: -Eleykum silaaam, bê bê bê, bêri roşî.

Hefî ra zî ageyreno cenîya xwi ser di, vano:

-Ti ci sey herî pay ra vinderta! Ay tifingan bigiri dês di bîleqni!

Cenîya jey tifingan gêna ewra leqena, Hesen û Eyb roşenî. Fikrî Mistî bêbexley (xayîney) a.

Mist vano: -Şima xeyr o?

Hesen vano: -Wa Wireyiji ma rî tîkê peran peyda kî, fişek-mîşekê ma çînî.

'Elê Hefsî hamewo ewra pay ra winderto, zamay Mistî yanî Mehmedê Avlay zî ewra vinderto.

Mist vano: -Wey, wa peyda kî. Peyda kenî, sey herî peyda kenî.

Mist ina vano û nişka ra xwi fineno Hesi tebîşeno. 'Elê Hefsî û Mehmedê Avlay zî perrenî Eyb tebîşenî. Vanî "Resne beerî (biyârî), resne, resne!"

Resne anî, polanê Hesenî û Eyb pey di pêt bestenî, xeberi danî qereqolê Pîranî. Xwi ra hukmatî ti ra ver zav çarnawo, nêşinawo jînî bîtebişo. Pîran ra yew mefrezez cendirman yeno, jînî beno Pîran.

Vanî "Jînî berî ewra ay bin di bikişî." Benî binê Pîranî di, ay hîran a wîrdînî kişenî.

### SI'ÎDÊ MELA MİSFAY

Inê memleketê ma di, Pîran di çîkî şar bi ardimê Şêx Se'îdî kerd; Si'îdê Mela Misfay û Zîlfî Ca'firî tena ardimê jey nêkerd. Semedê aya ra zî hukmatî jînî ra hes kerdinî. Vanî Kemal Paşa, Si'îdê Mela Misfay kerdî xefiyey inî memleketî. Qala jey wali ra zavêr pere kerdî.

Si'îdê Mela Misfay zemanî hukum kerd labrê mîrdimanê jey û Key Axay (45) yewnan kiş. Di hebî birazay jey kişiyyat.

Rojê pîllanê Key Axay, mîrdimanê xwi ra di xorî erşawîti Dîyerbekir ki jey bikişî. Si'îdê Mela Misfay, Walî û Qumandarê Qolorduy, Dîyerbekir di kursiyan ser o ronîste benî. Ay di hebî xorî şonî inşanî miyan di dabançan pa nanî, Si'îdê Mela Misfay kişenî.

(30)Kemal Paşa: Mustafa Kemal Paşa, Atatürk.

(31)Tewrin (Town): Nîzdî dewa Dîyerbekir di yew ca wo.

(32)Key Koçan: Yew mehla dewa Dêrey a.

(33)Ehmedê Huseyn Axay: Pîye mara Mehmet Salim Ensarıglı yo (Mehmet Salim Ensarıglı, ewro meb'üsû "Doğru Yol Partisi" yo).

(34)Kufarbi (Kuferbi): Yew dewa Pîranî ya.

(35)Delu Fikrî: Şarê dor-marê Pîranî hima zi gedanê xwi pey na-meyê Delu Fikrî tersnî. Gama ki wazeni gedan bitersnî, vanî "Delu Fikrî yeno ha!"

(36)Dilbi: Nameyê yewmezraya Herêdanî yo (qezay Pîranî ser o bî).

(37)Herêdan (Heridon): Yew dewa Pîranî ya.

(38)Xizik: Yew şaxê roy Dicle wo.

(39)Bozanti (Pozanti): Ewro yew qezayê Edena (Adana) wo.

(40)Bazbindi (Bazbendi): Yew dewa Pîranî ya.

(41)Akragi: Yew dewa Pîranî ya.

(42)Tuyera Seffî:

## Hêza çakûç û Kurd

aqil bida wan.

Ev kes û hêzên "çep" argumentek wan ya din jî ew e ku dibêjin emperyalizm çavê xwe bera petrola Kurdan daye û ji bo wê jî divê meriv li dijî "Hêza Çakûç" be. Ew dibêñ qey petrola Kurdan di destê Kurdan de ye. Ew nafikir in ku Seddam bi petrola Kurdan çekêñ herî modern kirfîye û bi van çekan Kurd kuştine.

Heta Seddam li ser hukum be, lazim e li dijî wî, "hêzên pêximker" (caydiricî) hebin û ew Kurdan biparêzin. Heta ev "Hêzên pêximker" yê Netewêñ Yekbûyi ne tenê li hember Seddam, divê ku li hember zordestiya Tirkîyê û Iranê ji hebin. Ma cîma hêzên "rast û çep" ên Tirk giş naxwazin li Bosna Hersekê ji bo

parastina Musulmanan hêzeke wiha bi cî bibe? Cîma çaxa dor tê Kurda emperyalizm tê bîra her kesî?

"Hêza Çakûç" çiye Hêza Wezifaya Yekbûyi ku Amerikî jê re dibêjin "Provide Comfort", Îngilizî dibêjin "Operation War-den", Fransî dibêjin "Acuv-it", Tirk jê re dibêjin "Çekîç Güç" û Kurd jî dibêjin "Hêza Çakûç" pişî Şerê Xelîcê di çercêwa bîryara 688 a Konseya Ewlekari ya Netewêñ Yekbûyi di 5'ê Nisan 1991'ê de li dijî êrisen Seddam ji bo parastina Kurden paralela 36'an de hat avakirin. Ji Tirmeha 1991'ê û vir de "Hêza Çakûç" ku ji leşkerêñ DYK, Îngilistanê, Fransayê û Tirkîyê pêk têñ, li Silopiye, li Pirinçlikê

(Diyarbekir) û li Încirlikê (Edene) bi cî bûn. Nuha du qumandarê vê hêzê hene; yê Amerika John Hawley û yê Tirkîyê jî A. Nail Esener e.

Ji aliyeñi ve Tirkîye bi leşkerêñ xwe besdarî "Hêza Çakûç" dibe û hemû prosesa wê de cî digre û "têki-liyên" hundir yê "Hêza Çakûç" dizane. Û ji aliyeñi din ve jî ji ber ku di destê Tirkîyê de balafirêñ tanker tunene, ew hemû piloten xwe yên şer di van balafiran de perwerde dike. Hin pispor dibêjin ger ev balafir ne li Tirkîye bûna Tirkîye wê nikaribû piloten xwe bi milyaran li ser van balafiran perwerde bikira. Ev jî tê wê manê ku Tirkîye bi kevirek du çûkan dikuje.

Lewend Firat

*jî alî işaretan ve Latînî ligor ya Erebî hêsanîr e. Çimkî kêm işaret in. Yê duwem alfaba Kurdi ya Erebî vokaleke Kurdi, vokala "i" dizwe. Mesela "KIRIN" gava ku bi herfîn Erebî were nivisîn wek "KRN" tê nivisîn.*

*Dîsa di alfaba Latînî de rastnivisîn heye. Tu dikarî bi herfîn mezin dest pê bikî. Sifet û navên taybetî bi herfîn mezin dest pê dîkin. Di Erebî de ev nîne. Alfaba serdest iro Latînî ye. Ji alî teknolojî ve û hîn gelelek tistîn din jî.*

**Emîr Hesenpur:** Mesela işareten li ser herfan ne mesele ye. Li herfîn Yûgoslavî û Tirkî binerîn işareten wan jî pir in, mesela: \$, Ç, Ü, I, Ö, Ģ.

Ji herf bêtir şikil muhim e. Çunkî şikil di mîji de cih digre. Mesela "MIR", gava ku ez vê gotinê dixwînim, ez nabêjîm "M" "I" "R", ez yekser dibêjîm "MIR". Yanê wekî ku bibêjîm "SER", lê nabêjîm Çav, Poz, Dev, Por û hwd. Alfaba Îngilizî Latînî ye, lê gelek zahmet e. Çunkî ne fonetik e. Lî Tirkî fonetik e. Ji bo her dengekî herfîk heye. Di Fransî de dengê "o" bi gelek awayan tê nivisîn, bo nimûne "cousteaux" (kûto), li vir "eau" dengê "o" dide. Lî di ya fonetik de dengê "o" bi işaretekî, yanê bi "o" yan jî bi "ɔ" tê nivisîn. Nuha ji van herduyan kîjan zahmet e? Bê guman ya Fransî zehmettir e. Ya Îngilizî jî her weha ye. Ji xwe muddeta fîrbûna alfaba Kurdi û Tirkî ji ya Îngilizî kîmtir e.

*"Disan ji dest wan sorgulan pir can ji xala filfilan Perde ji tayê sunbulan bend bûm bi dava bendîyan"*

4) a-Ne, no, nexêr (berevajî). b-Ş, şuxul. c-Sembola Magnezîyûmê. 5) a-Bajarekî kevnê Asûriyan, her weha navê kevnê Müsilê ye. b-Bî İngilizî 'vekir'. 6) a-Xwari-nênu ku ji savar û birinc û hwd. c-Feodal, derebeg. 7) a-Sînonîmeke 'êdi'yê. b-kole, bende (berevajî). c-Sînonîmeke 'agir'. 8) a-Paytextê Yûnanîstanê. b-Bîna, xanîyê mezin. 9) a-Veqetandeka binavkirî. b-Sînonîmê 'ku' (berevajî). c-Xwerû, bi temamî (berevajî). 10) a-Sînonîmeke 'tebax, teyfik' (berevajî). b-îrade c-Roj 11) a-Navê mehekê. b-Sînonîmeke "didan'ê. 12) a-Ciyê ku av jê tê vexwarin. b-Roja ku em tê de ne. c-Sînonîmeke 'mih, mîgel'ê.

**S. Rêving:** Gelo ya Erebî û Farisi ji weha ye?

**Emîr Hesenpur:** Na ya wan piçekî zehmettir e.

## City Restaurang

Li Stockholmê Aşxana Kurdi

Dilê we diçe xwarineke Kurdi:

- Serûpê
- Kalek
- Tirşik
- Pel û dolme
- Kutlik

û gelek babet xwarinê Rojhilate

Fermo werin aşxana Kurdi !  
Xweş, paqij û bi lezzet !


Bîra: 19 :-

Ji bo fest û şahîyen we yên xusûsî, li gor daxwaza dilê we, xwarin û vexwarin tê amadekirin.

Vasagatan 46  
Tel: 08-21 27 07

## Xa Çepîrs

Amadekar: S. Rêving




**ÇEPERAST** 1) a-Şâîrê bi nav û deng ê Kurdistana Iranê. Di de-wra Kurdistana Mehabadê de li gel Hejar Mukri-yani kovara Helale derxistîne. Bi navê "Naley Cudayî" û Tarîk û Rûn" du diwanen wî derketi-ne. Çarînek ji dîwana wî; Naley Cudayî weha ye: Derdi dûrî derdi kuşîmî Derdi wusîrî sebûrî kuşîmî Yâfiyan û wulatim rôj û şew Ley heram kirdim qerar û xurd û xew.

b-Demsalek 2) a- Bi Soranî 'ev der,vir'. b-Reşayîya bin sêlê (berevajî) 3) a-Dawet yan ji na-van qîzan. b-Paytextê Awistîrya (Nemse)ye. 4) a-Navê kovareke Kurdi ku di 1942'an de li Şamê ji aliye Celadet Bedirxan ve hatîye derxistin. Li ser hev 28 hejmar deketine ku yekem kovara Kurdi ye bi rîsm e (berevajî). b-Ax û of a nexweşan her weha navê qîzan e. 5) a-Ne tîjî, b-Hejmarek 6) a-Bê işî, bê şuxulî. b-Sînonîmepeyva 'şen'ê. 7) a-Vajî, meqlüb b-Dacekek. c-Olî, ayînî. 8)

Ferman 9) a-Palêñ cihêñ ku axa wan bi kîl e. b-Ne bejî, bi av. c-Di muzîkê de notayek. 10) Hukum-dar, serekê iparatoriye-kê. 11) a-Bajarek li Kurdistana Bakur ku dikeve bakurê Çiyayê Cûdî. b-Ne helal 12) a-Têhnî, kesê ku avê dixwaze. b-Bajarê Şêx Se'idê nemir. c-Navê rojekê (berevajî)

**SEREJÊR** 1) a-Ne bi lez, yawaş. b-Sînonîmeke 'lastik' a doxînan. 2) a-

## Bersîva hejmara berê



## "Divê azadiya her...

*ji alî işaretan ve Latînî ligor ya Erebî hêsanîr e. Çimkî kêm işaret in. Yê duwem alfaba Kurdi ya Erebî vokaleke Kurdi, vokala "i" dizwe. Mesela "KIRIN" gava ku bi herfîn Erebî were nivisîn wek "KRN" tê nivisîn.*

Ez di sinifa çaran de bûm min hê jî nikaribû bi başi bixwenda û binivîsanda. Çimkî zehmet bû. Lî nuha metodênuh çêkirine. Zarak zûrî fîr dibin.

Lî di alfaba Kurdi ya bi herfîn Erebî de problemek weha tuneye. Çunkî ew jî alfabekeyk fonetik e. Ji bo her dengekî işaretek heye. Kîmasiya ku di ya Erebî de ye ew jî wek we got mesela herfîn biçûk û mezin e, lê ew jî ne müşkile ye nuha. Dengê "i" ku wek işaret di alfaba Kurdi ya Erebî de tuneye, bi min ne problem e.

**Malmisanij:** Bas e ger mesele tercîh be? yanê iro gava ku tu dibêjî "MIN" û bi alfaba erebî "m" (MN) tê nivisîn. Di ya latînî de nûneren hemû dengan hene, lê di ya erebî de tenê yê du dengan heye. Gelo ya latînî rasstir û hêsanîr xuya na-ke?

**Emîr Hesenpur:** Rast e, belkî ji bo Erebî û Farisi weha be. Mesela di Farisi de "m" dikare wek "MIN, MEN, MUN, MÜN, MON" were xwendin. Lî di

Kurdî de problemek weha tuneye. Çunkî "m" û di Kurdî de tu mecbûrî wek "MIN" bixwînî. Ji ber ku " " (MEN, MAN, MUN, MÜN, MON) di Kurdî de her yek bi awayekî tê ni-vîsin. Ji ber wê jî gava ku Kurdeki xwendê vê gotinê, "bixwîne, bêyî "MIN" nikare b tu awayekî din bi-xwîne. Lî ev yek ji bo Erebî û Farisi ne weha ye.

Ev problem di gelek zimanen de heye. Heta di gelek zimanen ku bi latînî dinivîsin de jî heye. Mesela di ingilîzî de herfa "X" nûnerê sê denga ye, "iks", "S", "Z" ye.

Ji ali teknîkê ve jî computer û teknîken din ên ku ji bo latînî hene hemû ji bo herfîn erebî ji hene.

Bi ya min di alfaba Kurdi ya erebî de ji ali fonetikî ve qet problemek weha mezin tuneye. Têri zimanen Kurdî dike. Tenê kîmanîya herfîn Erebî ji ya Latînî bi min du tiş in ku ew jî : 1- Herfîn mezin û biçûk tuneye, 2- Di nivisîn de herfîn Erebî bêtir cih digrin. □

## K. XELİL AFRİNİ (YEKTA)

Hevalê hêja, şoresger û welat-parêzê giranbuha, endamê PRK-Rizgari heval **YEKTA** di 16.12. 1992'an de bi destê hêzên tarî li Dortmundê (Almanya) hat qetikirin.

Emê têkoşîna wi di şerê ji bo Kurdistaneke azad û serbixwe de bidominin.

**Partiya Rizgariya Kurdistan PRK-Rizgari Liqê Ewrûpa**

# Li Êrivanê Sinemastudya Kurdi

Têmûrê Xelîl / Erivan

Roja 5'ê Çiriya Paşin li Êrivanê, li "mala sinema"-yê studyoya sinemayê "Ro" hat vekirin. Di merasima vekirinê de nûnerên rewsenbirên Ermeni û Kurd, xebatkarê pressê, radyo û televizyonâ Ermenistanê, mîvanan ji Kurdistanê û Australiyayê besdar bûn.

Merasim bi peyya serokê Sinematografistên Ermenistanê Rûbêñ Gêvorgyans vebû. Ewî rol û kemala vê bûyerê da diyarkirin, pîroz kir û peyy da serokê seksiyona niviskarên Kurd li Yekitiya Niviskarên Ermenistanê Karlanê Çaçan.

- Ez bi navê gelê xwe yê 30 milyoni sipasiya xwe didime hukumeta Ermenistanê, Wezareta Çandî, Yekitiya Sinematografista bona xemxuriya hindava gelê me da. Cara pêşin nîne ku sinematografistên Ermenistanê dixwazin filmên dokumenter, bedewîtiya derheqa jiyana me da bikîşin. Ew karê kîrhatî ji salen 20'i ve des pê bûye. Filmên bedewîtiya "Zerê" (1926), "Kurdên Êzdî" (1933), dokumentera "Kurd" (1949), "Kurdên Ermenistanê" (1959) nişana diyarbuna gelê Ermeniya xerxa ziyyîye ye hindeva me da.

## Kovareke Kurdi ya nû; Nûbihar

Kovareke çandî, hunerî û edebî ye. Mehê carekê xwerû bi Kurdi, li İstenbolê derdikeve. Heta nuha sê hejmaran wê derketine. Her hejmarek wê 32 rûpel in. Xwedî: **Mahmut Yarluğ**, Berpirsiyar: **Suleyma Çevik** e. Bi qasî ku ji naveroka kovareke tê xuyakirin, kovareke dînî û Kurdi ye.

Hejmara wê ya pêşin di Çiriya Pêşin 1992'an de derket. Hin nivisîn hejma ra pêşin ev in:

Ne zalim be, ne mazlûm / Osman Kara

Cend ayetin ji Qur'aña Mecid/Azad

Cend hedîsin ji Pêxembere Ekrem/Azad

Heppeyivinêk bi serokê Komela Piştgiri Ji Bona Mafen Mirov û Mazlûman (Mazlûm-Der) M. İhsan Arslan/Nûbihar

Peyîvîn Rastan/Nûbihar

Ey Geli Kurdan/Mela

Se'îdê Kurdi

Şerefa redkirina her tişte ku mixalîf azadîya me ye/Sabah Kara

Jiyanname û tékoşîna Be-diuzzeman Se'îdê Norsî/Suleyman Çevik

Newaya mutrib û çengi/Mela Ehmedê Cizîri



Kovara Nûbihar, no: 1

Rojnama "Volkan" û "Cemîyeta İttihadî Muhemedî"/Osman Tunç

Herweha li ser navê Weşanen Nûbiharê ev kitêbén Seîdê Nûrsî bi Kurdi derketine:

- 1- Risala Biratiyê
- 2- Peyîvîn Piçük
- 3- Peyîvîn Bist û Sêyemin
- 4- Risala Tebîbetê
- 5- Risala İklasê

Navnîşana xwestinê:

Fevzî Paşa Cad. Başhoca

Sk. 49/1

Fatih/İstanbul

# BEROS



Mahmûd Lewendi

## Bira bira ye, bazar cuda ye

Muslimanan digotin eman gidî divê em musliman hemû bi hev re li dij gawuran şer bikin. Me jî got baş e, û me û birayêne yê Erebêñ musliman me bi hev re li gawuran xist, paşê jî van birayêne yê musliman li me xistin.

Kemalîstan digotin eman gidî dîn ji dest çû, welat ket bin lingê işgalkeran, birayêne Kurd werin em bi hev re li van işgalkeran gawur xin. Me jî got baş e, û me bi hev re lêxist. Paşê jî van birayêne yê musliman jî li me xistin.

Xumeynî digot eman gidî welat û dîn ji dest çû, birayêne Kurd werin em bi hev re li dij Şahê kafir û xwînrej şer bikin. Me jî got baş e, û me bi hev re Şah ji ser text xist. Paşê jî birayêne yê Xumeynîne musliman jî li me xistin.

Nuha jî nevîyen wan

Gava ku Doğu Perinçek, Bülent Ecevit, Mesut Yilmaz dibêjin "bira Hêza Çakûç ji welatê me derkeve, çimki işxalker e", mirov wan tam dike. Ji ber ku mîjîye wan mîjîye işxalkerî din naxwazin.

Wan bi xwe Kurdistan işxalkirine, çîma li dij işxala xwe dernakevin. Doğu Perinçek li şûna ku dibêje "Çekîç Güç Defol" û mitîngan çedike bila mitîngân "Türk Ordu-su Defol" çêke. Ma çedike? Mîjî mîjîye Kemalîstan e û li gor menfeeta xwe ya millî hereket dîkin.

## JI ME RE QEBEHET E

Çendeki berê di gelek rojname kovaren çep û rast ên Tîrkan de xeberek li ser butçeya Enstituya Kurdi ya Parisê derket. Li gor xebera van rojname û kovaran; dewleta Franse, Swêd, Swîsre û Belçikayê alyariya maddi bi Enstituyê re kirine. İcar xeber bi awayekî welê dane ku mirov dibêje

qey Enstituyê alyarı ji ciyekî pir xerab girtiye û ji bo karê xerab bi kartine.

Ev serê cend salan e dewleta Türk ji bo ku bikaribe alyariyekî ji dewleten Ewrûpayê bigre -ku carna digrin jîhemû rê û rîgayan bi kar tînin. Ji xelkê re adet e, ji me re qebehet e.

## ne karê aqila ye lê rast e

Amadekar: **Hesen Mizgîn**

■ Amerîki ji bo ku mesrefa xwe ya lêkolîna asûmanê kêm bikin, dixwazin li hîvî fabrika oksijenê ava bikin. Minerala ku Amerîki dixwazin jê oksijen peyda bikin ilmenit e û li hîvî pir e. Mineral ji oksid, hesin û titanê pêk tê û formûla wê FETIO3 e. Pişti ku Amerîki dest bi peydakirina oksijenê kîrin wê hew bi xwe re ji dinê oksijen bibin.

■ Jîna bi hemle (dûcan) dema cixarê dikşîne zirara mezin dide zarokê xwe. Ji ber ku duxana cixarê kapasita cigeren zarok kêm dike, zeif dixine. Riska ku zarok bi astimê bikeve zedetir dibe.

■ Bilbil di fîrbûna xwendinê de gelik jîr in. Hin zoologen Almanî li ser çelikîn bilbilan lêkolîn kirine. Di vê lêkolînê de dîtine ku bilbil di fîrbûna xwendinê de gelek jîhati ne û dikarin di 2-3 heftan de heta 60 dengen cûda cûda fîr bibin.

■ Li gor lêkolîna lêkolîneren Üniversita California li Los Angelesê (DAY) kesen di rojekê de 300 miliagram vitamina C dixwin emrê wan direjtir dibe. Merivê ku di rojekê de 150 miliagram vitamina C dixwe ji yê ku 50 miliagram dixwe du sal zedetir dijî. Ev yek ji bo jinan jî derbas dibe.

■ Li gor lêkolîneke psikolojik car carina munaqşekirina jîn û mîr ji bo siheta herduya lê bi taybeti ji bo pir baş e. Li gor encama lêkolîna psikologe Üniversita Michigan li Ann Arborê (DAY) Julis car carna munaqşê-kirin krîza dil ji holê radike.